Azadiya WELAT

Rojnameya Hefteyî

158

6-12 reşemî (Şubat) 1999

BUHA (Fiat) : 250.000 TL

ISSN 1301-7497

Rewşenbîrên kurd û tirk li HADEP'ê civiyan:

# Li dijî konseptan amadekarî divê



❑ Roja 10'ê reşemiyê di bin banê HADEP'ê de 86 rewşenbîrên kurd û tirk gihîştin hev û rewşa dawîn a siyasî û tedbîrên pêwîst nîqaş kirin. Di vê civînê de hate gotin ku rejîmê biryar girtiye ku HADEP'ê li derveyî hilbijartinê bihêle, lê divê li hemberî vê yekê gelê kurd amadekariyên xwe bike û li ber xwe bide. Her wiha hate xwestin ku hêzên demokratîk yekîtiya xwe xurtir bike. (Nûçe: R.3)



Nivîskar Suzan Samancı:

# Min divê ji bo hemû dilan binivîsim

■ Suzan Samancı, di warê wêjeyê de digel nivîskariya xwe bi jinitî û nasnava xwe ya neteweyî jî berbiçav dibe. Her çiqas ew bi tirkî dinivîse jî, ji ber ku tevna berhemên wê li ser êş û azarê kurdan hatiye rêstin, balê dikişîne. Lewre berhemên wê bo gelek zimanên biyanî jî hatine wergerandin.

■ Samancı, dibe ku yekemîn nivîskara kevanî be. Hevpeyvîna bi Samancı re, li ser rewşa jinan, nenivîsîna bi kurdî, berpirsiyariya nivîskaran û hwd. R.8-9

www.avestakurdi.org

Azadiya WELAT



SAMÎ TAN

# Agirkuj û komara agirpêketî

**Agirkujiya Demirel jî wekî her tiştê wî li derveyî edetan e. Li cihê ku ew ji bo çareseriya kêşeyan xebatê bike, ji bo bincilkirin û tepisandina kêşeyê tevdigere.**

Serokê Komara Tirk Süleyman Demirel li pey hev hişyarname û gefên xwe rêz dike. Li gorî wî propogandaya li dijî artêşê ne karê aqilmendan e. Heke dewlet artêşê neparêz e, dê artêş xwe biparêze. Demirel xwe wekî agirkuj (îtfayecî) bi nav dike. Ew jî tiştekî nîşan dide, agirkuj ji bo cihê ku agir pê ketiye pêwîst e. Xuya ye ku agir bi daw û delingê komara tirk ketiye.

Agir bi komarê ketiye lewre, gelê kurd tevî hemû zilm û zora dewletê jî dev ji doza xwe bernade. Mirovên azadîxwaz li dor partiya xwe HADEP'ê dicivin. Partî jî tevî doza girtinê jî amadekariyên xwe yên ji bo hilbijartinê didomîne. Li hemberî van êrîşên neheq û nehiqûqî kesên ku berê ji têkoşînê dûr sekinîbûn jî nêzî partiyê dibin.

Agir bi komarê ketiye, lewre tevî hemû xebatên wan ên astengkirinê jî parlementoya Baskê biryara vexwendina PKDW'ê ji bo ku civîna xwe di cihê wê de pêk bîne, pejirand. Her wiha Kongreya Neteweyî hefteya çûyî Peymana xwe ya bingehîn daxuyand.

Piştî danîna kongreyê êdî kes nikare li ser navê kurdan dest bavêje hin lîstikan, kesên ku li dijî berjewendiyên neteweyî xebatê bikin, êdî dê wekî xayin bên binavkirin û îlankirin. Li nik vê yekê Platforma Hêzên Neteweyî ya Bakurê Kurdistanê jî xebatên xwe didomîne.

Agir bi komarê ketiye, lewre didin ser hev, didin ber hev, hesabê wan ji hev dernakeve. Baweriya gel bi siyasetmedarên tirk nemaye. Li gorî anketan ji sedî 35'ê hilbijêran piştevaniya tu partiyê nakin. Ango îro partiya desthilatdar kesên bêbiryar in. Lewre jî ji hilbijartinê aramî dernakeve. Hê jî Fazîlet partiya yekemîn e, lê artêş nahêle ku ew partî hikûmetê ava bike.

Di warê aborî de komara tirk û IMF'ê li hev nekir. Ew jî tê wê wateyê ku dê di rojên pêş de krîza aborî kûrtir bibe. Xwedêgiravî rêjeya enflasyonê kêm dibe, lê îro dolarek beramberî 335 hezar lîrayê tirkan e, ev hejmar her roj zêdetir dibe. Rêjeya mezinbûna aborî daketiye binê sifirê, aborî li ser pereyên qirêj û rantê dimeşe. Tu giringiya hilberandinê nemaye.

Divê mirov hinekî li ser agirkuj jî raweste. Agirkujiya Demirel jî wekî her tiştê wî li derveyî edetan e. Li cihê ku ew ji bo çareseriya kêşeyan xebatê bike, ji bo bincilkirin û tepisandina kêşeyê tevdigere. Xwediyên rejîmê bi kampanyayên sexte, bi gefan dixwazin rê li ber eşkerabûna kêşeyan bigirin. Li aliyekî bi hemû hêza xwe êrîşî gerîlayên ku li gorî agirbesta yekalî tevdigerin, dikin. Li aliyê din bi kampanyayên bêbînî îdia dikin ku li bakurê Kurdistanê her tişt asayî bûye, şer qediyaye, gel di nava xweşî û dewlemendiyê de dijî.

Kesên ku rastiyê eşkera dikin jî tên girtin û kuştin. Bo nimûne, Aşîkar Kılıç xortekî 17 salî ye, Serokê Komîsyona Ciwanan a HADEP'a Nisebînê ye. Aşîkar ji ber ku rojnameya me belav kir, hate girtin û tewqîfkirin.

Divê bê zanîn ku agirkujiya bi vî rengî, agir gurtir dike. Ew agir dikare agirkuj jî bişewitîne, lewre jî divê rengê agirkuj biguhere.

# Çira Komcivîna Neteweyî

M. ZEKÎ ETİZ

Têkoşîna Azadiyê ji bo yekîtî û rizgariya gelê kurd derfetên giranbiha û berfireh afirandine. Di vê pêvajoyê de civîn û çalakî bo avakirina tevgereke neteweyî hatin lidarxistin. Amadekariya Komcivîna Neteweyî û damezirandina Platforma Neteweyî ya Hêzên Bakur nimûneyên berbiçav in.

Ev gav çira hatin avêtin. Ji ber ku gelê kurd di dîrokê de tu car wekî îro nêzîkî serxwebûn û azadiyê nebûye. Dîsa mîna îro nebûye xwedî merc û derfetên netewebûnê. Heta rewşa îro ya kurdan wekî rewşa neteweyeke bêdewlet tê nirxandin.

Ev pêvajo, ji bo rêxistin, ronakbîr, hunermend û şexsiyetên navdar ên kurd fersendeke mezin e. Pêwîst e ev fersend were nirxandin û herkes hemû derfetên xwe seferber bike û bi dil û can bixebite.

Wekî tê zanîn gelê kurd çiqasî nêzîkî serxwebûn û azadiyê bûye, ewqasî jî di bihurên teng û dijwar re derbas bûye. Ger di rojên wiha de partî û rewşenbîr neyêne cem hev û yekîtiya neteweyî pêk neynin, wê kengê çêbikin. Îro mercên yekîtiyê ji her demê guncantir in. Pêdiviya gelê kurd ji her demê bêtir bi saziyeke ku vîna wî dinimîne, heye. Bêguman çend sedemên vê yekê hene.

Yek; bi geşbûna şerê azadiyê re bi taybetî piştî meşa azadiyê, hestê gelê kurd ê neteweyî gihîştiye asta herî bilind û gele kurd sînorên di mêjiyê xwe de hilweşandin. Serokatî li ser vê yekê wiha dibêje:

"Ji bo çi komcivîna neteweya kurd? Gelê kurd hê nebûye xwedî biryareke tam. Gelê ku ne xwedî biryar be, di mêjî de tune. Komcivîna Neteweyî ji bo xebitandina mêjiyê gelê kurd saziyeke giring e. Neteweya kurd xwedî dest, ling, çav û guh e. Lê mêjî tune." Pêwîst e partî û saziyên kurdan, mêjiyekî ku gelê kurd bike xwedî biryar biafirîne.

**Ger di rojên wiha de partî û rewşenbîr neyêne cem hev û yekîtiya neteweyî pêk neynin, wê kengê çêbikin. Îro mercên yekîtiyê ji her demê guncantir in.**

Du; Gelê kurd îro gihîştiya asta dewletbûnê. Kêşeyên neteweyî ji her demê girantir in. Divê bêne çareserkirin. Jiyaneke civakî bê rûniştandin û ji bo sererastkirina jiyana civakî divê rêz û rêçik û destûrname bêne danîn. Bo vê jî divê hêzeke ku îradeya kurdan dinimîne derkeve holê.

Sê; Îro kêşeya kurd di rojeva Ewrûpayê û cîhanê de cihê xwe girtiye û bûye kêşeya navneteweyî. Lê Ewrûpa li hemberî xwe hêzeke muxatab a ku gelê kurd dinimîne nabîne. Lewre pêdiviya heyeteke ku vîna gelê kurd din[imîne], heye.

Çar; Dijmin îro li hemberî Tevge[ra] Azadiyê hemû hêza xwe kiriye yek. B[i] yek stratejiyê û taktîkê tevdigere. Armanc tunekirina kurdan e. Lewre j[î] êrîşa xwe ya dawî bi navê "êrîşa tofanê" navand.

Li aliyê din dijmin dixwaz[e] çalakiyên ku ji bo Komcivîna Neteweyî têne lidarxistin bi riya kurdên xayîn û nokeran asteng bike û wan di warê navneteweyî de wekî nûnerên kurdan nîşan bide.

Îcar divê li hemberî dijminê ku xwe di hêlê de birêxistin kiriye, hêzeke mîna tofanê hebe û ev hêz dijmin ji binî ve bihejîne. Ji bo ku em li hemberî gel sûcdar û rûreş dernekevin divê em wezîfeyên xwe bi cih bînin. Bêguman di vî warî de peywira giran dikeve ser milê partî, ronakbîr, siyasetmedar û şexsiyetên kurd.

Yek; divê beriya her tiştî kes û saziyên navborî nakokiyên ku li hemberî yekîtiyê asteng in, ji holê rakin. Divê tu kes nebêje kêşeya vî parçeyê Kurdistanê ji yê din cuda ye.

Du; divê partiyên kurd tu car berjewendiyên xwe yên partiyî û şexsî nexin pêşiya berjewendiyên neteweyî. Pêwîst e ji bo yekîtiyê û vîneke azad tevaya rêxistin û sazî hêza xwe seferber bikin. Ji ber ku heta yekîtiyeke neteweyî pêk neyê serxwebûn ne gengaz e.

## Ferhengok

**arîşe:** kêşe, problem
**arizî:** xususî (özel)
**banû:** prenses
**berendam:** aday
**beşdar:** katılımcı
**binemal:** malbat
**binhişîn:** bilinçaltı
**bizav:** tevger, hereket
**cunûtin:** erdê şilî
**cûmik:** kortik û çalikên li ser lat û zinaran.
**çarenûs:** qeder, aqubet
**çewsandin:** zorlêkirin(baskı)
**derbirîn:** ifadekirin
**desthilatdarî:** serdestî, îqtîdar
**destkarî:** mudahale
**gil:** cureyekî şil yê axê.
**gotûbêj:** söyleşî, tartışma
**guherbar:** değişebilir
**hetîketî:** skandal
**hevalbendî:** ittifak
**hilbijêr:** seçmen
**keslan:** tiral, tembel
**lêsorbûn:** ısrar ya da yoğunlaşma
**leylan:** rewrewk, serap
**lûdo:** melodiya ku li ber pêz bi bilûrê tê lê dan
**navhildan:** adını anmak
**nefsbiçûk:** alçakgönüllü
**pakrewan:** şehîd
**panaz:** mucewherên derewîn
**rewisîn:** şewitîna por û pirçê
**rewrewk:** leylan, serap
**roşan:** cejn, îd
**serbajar:** paytext(başkent)
**sirûd:** marş
**sosret:** ecêb, tuhaf
**şerpîn:** rêjne (sağnak)
**teqez:** misoger (kesin)
**torim:** çêlika devê
**xortik:** çêlika kîvroşkê
**ziktilêr:** göbekli

*Rewşenbîrên kurd û tirk li HADEP'ê civiyan:*

# Li dijî konseptan amadekarî divê


Osman Özçelik


Şanar Yurdapatan


F. Huseyn Sağnıç

**86 kesayetiyên kurd û tirk der barê hilbijartinê de li Navenda Giştî ya HADEP'ê li hev civiyan. Di civînê de beşdaran li ser hevalbendiya hêzên azadîxwaz, stratejiya bo hilbijartinê, konsepta dewletê, hevkariya ligel partiyên din, taybetiyên berendaman û berendamên serbixwe dîtinên xwe vegotin. Di civînê de hemû beşdaran pêwîstiya hevkariyê destnîşan kir.**

Roja 10'ê reşemiyê li ser banga Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak , bi beşdariya 86 rewşenbîr, siyasetmedar, karsaz, hunermendên kurd û tirk li Navenda Giştî ya HADEP'ê li Enqereyê civînek pêk hat. Di civînê de helwest û polîtikayên li ser hilbijartinê hatin nîqaşkirin.

Civîn di bin rêveberiya Cîgirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Osman Özçelik de li dar ket. Özçelik, di axaftina destpêkê de bal kişand ser pêwîstiya diyaloga di nava hêzên demokrat û azadîxwaz de. Piştre li ser doza ku li HADEP'ê hatiye vekirin û bandora wê, hinek agahiyên pêwîst dan. Her wiha di dawiya axaftina xwe de jî, li ser danûstandinên bo îtîfaqa yên bi derdorên demokratîk re, rewşa dawîn li ber çavan raxist.

Piştî vê axaftina destpêkê, gelek kesan dîtin û ramanên xwe yên li ser pêvajoyê, konsepta dewletê, êrîşên li ser HADEP'ê û tedbîrên pêwîst anîn ser zimên. Bi awayekî giştî hate gotin ku rejîm dixwaze rê li ber temsîliya kurdan bigire û partiya wan HADEP'ê nexe hilbijartinê. Wekî çare jî hate xwestin ku HADEP xwe bi rêbazekê tenê sînor neke, hin riyên alternatîf jî bide ber xwe.

Her wiha kesên beşdar bal kişandin ser pêwîstiya hevalbendiya derdorên demokratîk û xwestin ku ji bo pêkhatina bloka aştî, azadî û kedê her rê bê ceribandin û heke fedekarî pêwîst be, HADEP xwe ji vê yekê nede alî. Li aliyê din hinek beşdaran da zanîn ku rejîm naxwaze hin partiyên çepgir xwe nêzî kurdan bikin, ji ber vê yekê jî ew partî xwe ji HADEP'ê dûr digirin. Hinek axivgeran ew helwest wekî sûcekî nirxand.

Hemû beşdaran kêfxweşiya xwe ya ji bo pêkhatina civîneke bi vî rengî diyar kir û xwestin ku civînên bi vî rengî di pêşerojê de jî pêk werin. Li ser vê yekê rayedarên HADEP'ê jî bersiveke erênî da. Bi taybetî gotina F. Huseyn Sağnıç a wekî "divê em nêzî hev bibin, da ku şeytan nekeve navbera me" ji bo diyarkirina armanca civînê û pêwîstiya yekîtiyê gelekî watedar bû.

### Ramanên hin kesên ku beşdarî civînê bûne

Tarık Ziya Ekinci: Li Tirkiyeyê rejîmeke faşîst derketiye holê, li dijî vê yekê pêwîstî bi pêkanîna eniyeke antî–faşîst heye. Di vî warî de hilbijartin gelekî girîng e. Heke di hilbijartinê de gavên pêwîst neyên avêtin, dê gelek tiştên xerab pêk werin. Lewre jî divê hêzên demokratîk û bi taybetî tevgera demokratîk a gelê kurd gavên pêwîst bavêje.

**Şanar Yurdatapan:** Hilbijartin gelekî girîng e. Divê dengê gelê kurd bikeve meclîsê, heke pêwîst be ji bo şikênandina bendê mirov dikare berendamên serbixwe jî deyne.

**M. Ali Eren:** Tiştê ku Dewleta Nehênî(Derin Devlet) dixwaze li ber çavan e. Ew dixwazin kurdan li derveyî sîstemê bihêlin, wekî tedbîr divê piştgiriya DEHAP'ê bê kirin. Heman hêz digel HADEP'ê dixwazin CHP'ê jî li derveyî sîstemê bihêlin, divê em vê yekê li ber çavan bigirin.

**Tomris Özden:** Bi serê xwe ketina hilbijartinê ji HADEP'ê re serkeftinê nayine. Divê bi baskê pêşverû yê CHP û, baskê kedkar ê ÖDP'ê re hevkarî bê kirin. Heke ew pêk neyê, divê li ser berendamên serbixwe bê fikirandin.

**Hasip Kaplan:** Rêveberiya herêmî gelekî girîng e. Îro giraniya serokê belediya bajêr a Amedê bi qasî serokê meclîsê ye. Divê bersiva êrîşên li ser HADEP'ê di bin sîwana HADEP'ê de bê dayîn. Di hilbijartinên giştî de bi riya îtîfaqan û berendamên serbixwe, divê bend bê şikênandin. Li hemberî çewsandinan, divê em rêxistinên navneteweyî yên wekî Rêxistina Ewlehî û Hevkariyê ya Ewrûpayê wekî çavdêr bikişînin herêmê.

**Mustafa Doğan:** Bi baweriya min sedema vekirina doza girtinê, ji vê yekê tê: Dewletê dît ku HADEP'ê dê bendê bişikêne, lewre gaveke bi vî rengî avêt. Lewre jî divê li ser dozê pir neyê rawestandin, da ku di serê gel de pirs çênebin.

**Sedat Aslantaş:** Ev civîneke dîrokî ye. Dewlet naxwaze rê li ber HADEP'ê vebe. Aliyê vê konsepta dewletê yê hiqûqî, siyasî û psîkolojîk heye. Divê em zorê dibin xwe, da ku îtîfaq pêk werin.

**Suna Aras:** Divê HADEP dilê xwe û hembêza xwe fireh bigire. Divê em nehêlin ku mirovek tenê jî ji me dûr bikeve. Ez li ser hevalbendiya bi navê "Ked, aştî û azadiyê" sor im. Divê teqez blokeke bi vî rengî pêk were.

**Veysel Çamlıbel:** Îro Kêşeya Kurd ketiye rojeva cîhanê. Têkiliya di navbera gelê kurd de, ku dişibe zewaceke bi darê zorê, divê ji nû ve bê sazkirin. Îro barê têkoşînê li ser milê gundiyên kurd e. Heta roja îro wan ew barê gelekî giran, gelekî baş hilgirtiye. Em spasdarê wan in. Lê pêwîst e, êdî bajarî jî bikevin bin bar.

**Feqî Huseyn Sağnıç:** Dema em li medreseyê li nik hev rêz dibûn, seydayê me tim digot: "Bila valahî di navbera we de nemîne, heke na dê şeytan bikeve navbera we." Îcar gotina wî çiqas rast bû, ez nizanim. Lê îro heke em di refên xwe de valahiyê bihêlin, dê şeytanê rastîn bikeve navbera me, lewre jî divê em têkiliyên xwe xurtir bikin.

**Ali Beyköylü:** Nîqaşa berendamên serbixwe berî niha bi 15 salan dihate kirin. Ji ber ku wê demê partiyeke me nîn bû, lê îro partî heye, lewre jî heyama têkoşîna ferdî li paş maye.

**Mehmet Şafi Ekinci:** Serokên Belediyeyan ji bo gelên bindest gelekî girîng in. Tecrûbeyên gelên mîna katalon, bask û îrlandiyan vê yekê nîşan dide. Lewre jî divê neqandina berendamên rêveberiya xwecihî gelekî bi zanatî û hûrbînî bê kirin.

**Selman Yeşilgöz:** Divê bi tu awayî em hevkariya bi partiyeke wekî CHP'ê re nefikirin. Lewre berpirsê hemû neyiniyên rejîmê ev partî ye. Ji bo ku sosyal–demokratên rastîn jî derkevin, divê ev partî ji holê rabe.

### Divê giraniya jinan zêde bibe

**Mukaddes Çelik:** Divê di polîtîkayê de giraniya jinan zêde bibe, lewre îro jinên kurd barê têkoşînê bi awayekî baş hilgirtiye. Îtîfaqa bi CHP'ê re li dijî gelên me neheqî ye, lewre jî divê em tiştekî wisa neyinin bîra xwe jî.

**Z. Abidin Kızılyaprak:** Divê têkiliyên bi medyayê re ji nû ve bên sazkirin. Divê HADEP giraniyê bide medyaya xwecihî, lê têkiliyên bi wê re divê ji navendê bê organîzekirin.

Canip Yıldırım: Divê navend di neqandina berendaman de destkariyê neke û rê li ber rêveberên herêmî negire. Lewre barê têkoşînê gelê herêmê hilgirtiye ser milê xwe. Divê em dewletê baş nas bikin û li gorî wê tedbîrên xwe bigirin. Lê pêwîst nake HADEP bikeve bin baskê tu partiyên din.

Her wiha di civînê de Fikret Başkaya, weşanger Sırrı Öztürk, Sedat Yurtdaş, Ahmet Türk, Altan Tan, Naci Kutlay, nivîskar Şükrü Laçin, akademîsyen Ahmet Özer, sendîkavan Sevil Erol, karsaz M. Kasım Fırat û gelek kesayetiyên din jî dîtin û ramanên xwe der birin.

NAVENDA NÛÇEYAN

www.arsivakurdi.org

# Xemxura bindestiya jina kurd û gelê Kurdistanê

# Mîna Qazî

Mîna Qazî dema pê dihese ku li bakurê Kurdistanê di nav refên gerîla de keç û jinên kurd li dijî dewleta tirk şer dikin, pir şa dibe û dibêje: "Xwestek û armanca me ya herî girîng di çaxê Komara Mehabadê de bi riya damezrandina Yekîtiya Jinên Kurdistanê beşdariya jinê ya hemû kar û barên civakî bû."



Xanima kurd Mîna Qazî, di sala 1913'an de li bajarê Mehabadê hate dinê. Navê bavê wê Ehmed û navê diya wê jî Gulendam e. Ew ji tayifa Hecî Hesen Xanî(Hecîbeg) ye, ku yek ji tayifên herî mezin ên li herêma Mikrûyan e. Beriya ku Mîna Qazî bi pêşawa Qazî Mihemed re bizewice paşnavê wê Îskenderî bûye. Di 19 saliya xwe de dibe hevala Qazî Mihemed. Partî Demokrat, girîngiyeke mezin dide mafê jinê. Dayika kurd Mîna Qazî, dibêje, li ser pêşniyara Serokomarê Kurdistanê hemû zêr û zîvên xwe pêşkêşî hizbê û Rêxistina Yekîtiya Jinên Kurdistanê kiriye. Bi biryara Hizba Demokrat Mîna Qazî bo berpirsiya giştî ya Yekîtiya Jinên Kurdistanê hatiye hilbijartin. Her sibe xwe gihandiye xwendegehê û bi zimanê kurdî perwerde bûye. Vî karê jina Serokomarê Kurdistanê gelek jin kişandine aliyê xwendinê û ji bo gelek kesan bûye nimûne.

Yekîtiya Jinên Kurdistanê di nava Komara Mehabadê de bi xebatên cur bi cur kete nav qada xebatê. Di çaxê desthilatdariya tund a Şahê Pehlewî de li tevayê Îranê û bi taybetî jî li Kurdistanê jin xwedî tu mafê civakî û siyasî nîn bûn. Keç bêyî îradeya xwe bi qelen dihatin firotin. Çarenûsa wan di destê mêr de bû. Mafê jinên kurd du car hindî mafê jinên din dihatin binpêkirin. Nezanî, nexwendebûnê û bi dehan derdên din berçêla jina kurd girtibû. Keçfirotin, zewicandina keçan li ser dergûşê, nextwergirtin, berdêl, berdana (telaq) jinan û markirina bi darê zorê, kuştina keçên ku bi dilê xwe bi xortekî re direviyan û hwd.

Mîna Qazî wekî berpirsiyara jinên kurd di civînan de ji wan daxwaz dike ku gir û giriftên xwe bînin zimên û ji bo çareserkirina wan probleman pêşniyarên xwe pêşkêş bikin. Yekîtiya Jinên Kurdistanê bi piştgiriya Komarê digel mêran hin mafên xwe bi dest xist. Jina kurd bi dilgermî beşdarî xebat û karên civakî bû.

### Beyanameya mafê jinan tê ragihandin

Di vê navberê de bi beyanameyekê ji herkesî hate xwestin ku qelenstandin, zewicandina bi zorê û hemû neheqiyên ku li dijî mafê jinê pêk tên, bêne rawestandin. Komara Demokratîk a Kurdistanê û di serî de Serokomarê Kurdistanê Qazî Mihemed piştgiriya xwe ji bo van daxwazên Yekîtiya Jinên Kurdistanê diyar kir. Dayika kurd Mîna Qazî, li ser kar û xebata xwe pir bi dilgermî radiweste û di demeke kin de bi gelek jinên ku li Kurdistanê bi rêz û hurmet in re dikeve nava têkiliyan. Bi riya şandina nameyan digel Hepsexana Neqîb dikeve danûstandinê û hevaltiya wan heya dawiya jiyana Hepsexaneya Neqîb dewam dike. Her wiha li ser Yekîtî Afretanî Kurdistan Gulîzar Xanima Şikak dibe mêvana wan. Wekî tê zanîn Gulîzar Xanim keça Cafer Axayê birayê Simayîl Xanê Şikak e, ku ji sala 1920'an heya 1930'an ji bo azadiya Kurdistanê digel dewleta Riza Şahê Pehlewî şer kir. Wekî Mîna Qazî dide xuyakirin Gulîzar Xanim jî li ser pêşniyara wê bûbû endama Yekîtiya Jinên Kurdistanê. Piştî demekê Yekîtî li dijî nexwendin û nezaniyê hevkariya malbatên feqîr û hejar jî dixe programa xwe ya rojane.

### Zarokên xwe bi kurdewarî gihand

Piştî têkçûna Komara Kurdistanê û bidarvekirina rêberên Komarê jî dayika kurd Mîna Qazî dîsa jî dest ji şopa pêşawayê Qazî Mihemmed berneda, zarokên xwe li ser bîr û baweriyên kurdayetiya paqij mezin kir. Ew bi raman, bîr û baweriyên Serokomara Kurdistanê hatibûn perwerdekirin. Mîna Qazî zordestî û sîtema serdestên dewleta Îranê nedipejirand. Piştî şehîdketina rêberên Komarê, bi rengekî aktîf di nav xebatkarên Hizba Demokrat de cih girt û di dawiyê de jî canê xwe li ser riya bi şeref û pîroz a doza Kurdistanê feda kir. Ew keça du mirovên mezin bû û perwerdeya xwe ya welatparêziyê ji wan wergirtibû.

Xanima kurd Mîna Qazî heya dawiya jiyana xwe ji doza niştimana xwe û azadiyê venegeriya Li ser vê hindê çend caran hat girtin, di girtîgehê de beramberî pir îşkence û zordariyan ma. Dema li ser rewşa gelê kurd diaxivî, tim digot: "Ji min re soz û peymana yekgirtina kurdan bidin, da ku ez jî ji we re mizgîniya dewleta serbixwe ya Kurdistanê bînim. Ji ber ku yekbûn û hevgirtina hêzên siyasî yên Kurdistanê dermanê hemû derdan e. Eger gelê kurd di navbera xwe de yekîtiyeke bi hêz pêk bîne, çêbûna Kurdistaneke serbixwe karekî hêsan e. Ez bawer im pir dereng nakişîne ku gelê kurd jî di cîhanê de bibe xwediyê pênaseke neteweyî. Hesreta Serokomarê Kurdistanê Qazî Mihemmed jî ev daxwaza dîrokî bû."

> Di çaxê desthilatdariya tund a Şahê Pehlewî de li tevayê Îranê û bi taybetî jî li Kurdistanê jin xwedî tu mafê civakî û siyasî nîn bûn. Keç bêyî îradeya xwe bi qelen dihatin firotin. Çarenûsa wan di destê mêr de bû. Nezanî, nexwendebûnê û bi dehan derdên din berçêla jina kurd girtibû.

Dayika kurd Mîna Qazî ku di nava gel de bi navê 'Dayê Xanim' dihat naskirin, xanimek bi hurmet bû. Gel pir jê hez dikir. Ew di dîroka hemdem a Kurdistanê de wekî mejûnameyek zindî dihate hesibandin. Pir zana û rewşenbîr bû. Haya wê ji cîhanê û rewşa bizavên siyasî yên Kurdistanê hebû.

Dema pê dihese ku li bakurê Kurdistanê di nav refên gerîla de keç û jinên kurd li dijî dewleta tirk şer dikin, pir şa dibe û her tim dibêje: "Niha êdî ez xilasiya gelê kurd nêzîk dibînim. Ji ber ku jinên kurd jî mîna mêran derketiye serê çiyan, bi siyasetê jî xebatê dide meşandin. Xwestek û armanca me ya herî girîng di çaxê Komara Mehabadê de bi riya damezrandina Yekîtiya Jinên Kurdistanê beşdariya jinê ya hemû karûbarên civakî bû."

Piştî şoreşa gelên Îranê û têkçûna desthilatdariya dewleta Şahenşah rojhilatê Kurdistanê ket bin destê kurdan. Dayê Xanimê jî dîsa dest bi xebata xwe kir. Lê desthilatdariya kurdan a li ser Kurdistanê vê carê jî zêde nedomand û di salên 1979,1980 û 1981'an de Kurdistan kete bin destê dewleta îslamî. Bi hezaran kurd hatin kuştin û bi hezaran jî di girtîgehan de hatin daleqandin.

Dayika kurd Mîna Qazî jî di sala 1986'an de nêzîkî salekê di bin çavdêriya beşa parastina Komara Îslamî de hate girtin. Her çend temenê wê ji 70'yî zêdetir bû jî lê dîsa gelek zordestî û işkenceyên giran li wê hatin kirin. Berpirsên Birêveberiya Îstîxbarata Îranê bi eşkere jê re gotibûn:" Eger mêre te (Qazî Mihemed) nebaya di Îranê de qet problema kurd û Kurdistanê nedibû." Piştî wê heya demeke dirêj dayika kurd Mîna Qazî ji mafê derketina ji Îranê bêpar bû û tim di bin çavdêriya beşa parastina dewletê de bû. Her wiha di sala 1988'an de keça Mîna Qazî li Swêdê bi destê hinek terorîstên dewleta Îranê ve hate şehîdkirin.

Mîna Qazî di 17'yê reşemiya sala 1998'an de li bajarê Mehabadê bi dinyayek hasret û kul, gihîşt rêza nemiran û bi yekcarî xatirê xwe ji gelê kurd xwest. Di roja wefat û veşartina wê de bi hezaran kes li ser goristanê amade bûn û bi merasîmek mezin li goristana bajarê Mehabadê hate veşartin. Ew niha bi fîzîkî ne di nava gelê xwe de ye lê wekî helbestvanekî kurd dibêje:"Namirin ewên di dilê gelê xwe de dijîn."

KAKŞAR. C. OREMAR

# Ferhengoka zanist û teknolojiyê

### Ferhengoka hevgirtî

Kêşeyeke li pêşberî zimanê kurdî ji yekgirtina têgihên têgihên heyî yên teknîk e. Ji hinek têgihên ku di ser zimanên dagirkeran ên wekî tirkî, erebî, farisî re hatine girtin pêwîst e ku bên standardkirin. Bo nimûne li rojhilatê Kurdistanê têgihek bi riya farisî ketiye nava zimanê kurdî, heman têgih li başûrê Kurdistanê bi riya erebî ketiye kurdî. Wekî mînak peyva "chemistry (kîmya)" di nav kurdên Rojhilat de wekî "Shemic (Şemîk)" tê bikaranîn. Li Başûr heman peyv wekî "Kîmya" tê zanîn. Heman peyva cuda tê bilevkirin. Hin caran jî vê peyv deynkirinê kurdî dewlemend kiriye. Bo nimûne di nava kurdên Başûr de bo têgiha bisîklet peyva "bicycle" tê bikaranîn, lê kurdên Rojhilat li şûna wê peyva "duçerxe"yê bi kar tînin. Ev peyv ji du hêmanan tê hatiye du û çerxe û ji zimanê farisî derbasî kurdî bûye. Nêzîkatiya di navbera kurdî û farisî de pêderxistina farisîbûna binyada têgihê dijwar dike. Lê ew rewş dibe sedem ku di kurdî de du peyv ji bo heman heyberê derdikevin pêşberî mirov.

Nifşên berê peyva danîşgeh bi kar dianîn, lê dema li Başûr zanîngeh vebû ji ber ku peyva danîşgeh wekî peyveke farisî dihat pejirandin, peyva zanko hate afirandin. "Zan" a li vê derê ji zanistê tê û paşgira /–ko/ jî wateya lê zêdekirin û komkirinê dide peyvê. Zanîngeh jî di kurmancî de dihat bikaranîn û bi derketina MED–TV'yê re zêdetir kete pratîkê. Ew jî ji peyva zanîn û paşgira /–geh/ ku wateya cih li peyvê bar dike, pêk hatiye.

Heke di zaravayekî kurdî peyvek hebe pêwîst nake ku mirov peyveke din pêk bîne. Heke peyveke ku di zaravayê soranî de hebe, di kurmancî de ji nû ve bê pêkanîn an jî heke kurmancî de hebe di soranî de ji nû ve bê afirandin, ew tişt xesarê dide zimên. Ew yek dubendiyê dixe nava zaravayên kurdî û kesên ku bi van zaravayan dipeyivin.

### Afirînerên têgihan

Li ser taybetiya kesên ku divê peyvan pêk bînin mirov dikare vê yekê bibêje; divê ew xwediyê zanîna bingehîn li ser zimên û wergerê, her wiha divê ew ji teknîka tiştên ku li ser têgihan pêk tînin jî xwedî agahî bin. Wate, kesên ku têgihan pêk tînin divê xwediyê şiyan û zanîneke teknîk û zimanzanî bin. Afirîner divê bi kêmasî bi zimanekî ewrûpî bi taybetî jî bi îngilîzî bizanin. Gelek rewşenbîr û zanyarên kurd ji vê zanînê ne bêpar in. Hejmara zanyar û endazyarên kurd ên li Ewrûpa û Amerîkayê zêde ye. Tiştê pêwîst ev e ku ew têkiliyê bi zanîngehên li Kurdistanê re deynin û bizanin ka tengasî û arîşeyên li ber wan çi ne. Endazyarên zimên (mirov dikare vê peyvê ji bo kesên ku têgihan pêk tîne, bi kar bîne.) pêwîst e li ser pêdiviyên saziyên kurdan, naveroka wane û mijara ku li dibistanên bilind tên fêrkirin, xwediyê agahiyên ku ji çavkaniyên sereke hatine wergirtin bin.

Ez hêvî dikim ev kurte destpêk dê rê li ber hinek gotûbêjên li ser kêşeyê veke û cesaretê bide zanyar û dozînerên kurd ku bi kurdî bi nivîsin. Her wekî mezintirîn helbestvanê kurd Goran ê vê sedsalê dibêje:

*Binivîse, nefikire û netirse.*

RÊBIWAR FATTAH
Werger: Samî Berbang

**Nîşeya wergêr:**
*Ev nivîs ji internetê navnîşan:http://www.cogsci.ed.ac.uk/~siamakr/Kurdish/Papers/Chyet96.html hatiye wergirtin. Nivîskarê nivîsê Rêbiwar Fattah editorê rojnameya Kurdistanî Nwê ye.*

Pişti ku waneyên rêzimanê kurmancî qediyan, di vê rûpelê de em cih didin hinek nivîs der barê zimanê kurdî de. Ev nivîs ji çavkaniyên cur bi cur têne girtin. Me divê ku ev rûpel heta demekê wekî warê nîqaşên li ser zimanê kurdî bimîne. Ev rûpel ji hemû zimanzan û zimanhezen kurd re vekiriye. Her mirovê/a ku li ser zimanê kurdî hûr dibe û serê xwe bi kêşe û arîşeyên wî diêşîne dikare ji me re nivîsan bi rê bike.

## Têbiniyek li ser rengê rûpel 5

Îro neyar li ser zimanê me li pey hinek dek û dolaban in. Hinek kesên xêrnexwaz dil dikin ku cudatî û kêmasiyên biçûk wekî hinceta biçûkxistina ziman û çanda gelê kurd bi kar bînin. Li ser zimanê me û zaravayên wî raporên derewîn têne amadekirin. Nivîs û gotarên bi riya vê rûpelê digihêjin ber destê gelê me dê ji dagirkeran re jî bibin bersiveke baş.

Tê zanîn ku zimanê kurdî zimanekî dewlemend û birêkûpêk e. Lê ew nayê wê wateyê ku tu arîşe û gelemşeyên zimanê me nîn in. Gelek kêşeyên zimanê me hene. Ew kêşe wê bi destê me bên çareserkirin. Kes dê ji derve neyê ji me re zimanekî têkûz amade neke. Lewre di vî warî bar dikeve ser milên hemû kesên ku di vî warî de xebatê dikin.

## Doza HADEP'ê û hilbijartin

NEJDET BULDAN


E-Mail:Buldan@compurserve.com

Serdozgerê tirk ji bo girtina HADEP'ê doz vekir. Serokomar û serleşkeran emir da ku di propogadanyên hilbijartinan de hemû saziyên dewletê hişyar bin da ku HADEP û endamên wê qala aştî û mafê kurdan nekin û Partiya Fazîletê qala îslamiya siyasî neke. Li ser vê yekê Dadgeha Ewlehiyê ya rêveberên HADEP'ê bernedan.

Ez bawer dikim ku yekemîn car e li cîhanê heftê roj berî hilbijartinan li partiyeke siyasî doza girtinê tê vekirin. Dîsa yekemîn car e ku serok û rêveberên partiyeke ku beşdarî hilbijartinan dibe di zindanê de tên hiştin. Balkêş e û pêwîst e ku dîrok vê dozê baş bişopîne. Gelek pêwîst e ku kurd vê rewşê baş bişopînin û kerb û înadeke neteweyî jê bistînin. Li ser vê rewşê du dîtin hene:

Li gorî çavkanî, zagon û hiqûqa tirkan heta hilbijartinan encama dozê diyar nabe. Lê dibe ku doz bilezî bê qedandin û di meha adarê de HADEP bê girtin. Ji ber wê çendê pêwîst e ku HADEP amadehiyên xwe li gorî girtina berî hilbijartinan bike. Yanî an li ser navê partiyeke din (mîna DEHAP'ê) beşdarî hilbijartinan bibe, an jî berendamên xwe wekî kesên serbixwe eşkera bike.

Her du dîtin jî rast in. Lê pêwîst e ku kurd li ser navê xwe tevlî hilbijartinan bibin. Em dizanin ku barê kesên siyaseta eşkera dimeşînin gelek giran e. Belê pêwîst e tevî hemû asteng û aloziyan jî kurd li ser navê partiyekê bikevin hilbijartinan, ew jî an HADEP e, an jî DEHAP e. Qet nabe ku kurd wekî kesên serbixwe beşdarî hilbijartinên giştî bibin. Dibe ku kesên serbixwe bên hilbijartin û biçin meclîsa tirkan. Lê zirarên neteweyî û navneteweyî gelek in di vî karî de. Kêmasiyek e stratejîk jê çêdibe.

Pêwîst e ku em bizanin ku dewleta tirk di van hilbijartinan de zêde tengav bûye. Hêj gelek lîstik û lêbên dîtir dê deynin ber kurdan, pêwîst e gelê kurd li hemberî hemû asteng û zoriyan li ber xwe bide. Tu çareyeke din nîn e.

Şerleşkeriya tirk û dewlata wan ji berendamên kurd an jî siyasetvan û hilbijêrên kurd ditirse. Gefên serokomar û serokwezîrê wan işaretên vê yekê ne. Agahiyên ku digihîne ber destê me li dijî hemû zilm û zoriya wan welatparêziya gel zêdetir dibe. Civînên bajaran tên çêkirin tevlêbûna jinan ya bi qehremanî û bêtirs bersiveke giring e. Beşdarbûna xortan, hembêzkirina gel ya HADEP'ê bersiveke dîrokî ye. Serdanên biçoş û pirbûna berendamtiyê bersiveke mezin e û gelekî watedar e.

Pêwîst e ku em li tiştekî hişyar bibin. Harîkar û hevalbendên dijminî yên ku bi kurdî dipeyivin. Em qala tu şexsan nakin, navê wan ne giring e. Lê belê dibe ku li ser rewşa wan jî em bisekinin. Ka bila berendamên partiyan eşkera bibin. Ew ji bo careke din.

www.arsivakurdi.org

## Miroveki nefsbiçûk û diltenik:

# Metin Yurtsever

“Di hundirê Partiyê de ji sexelên 3 mehî heta zarokên 7 salî, kesên navsere, jinên ducanî, kal û pîr hebûn. Em bi qasî 60 kesî bûn.Elektrîkên me birîbûn. Em di tarîtiyê de mabûn. Ev yek bûbû sedema gengeşiyan. Em li benda êrîşekê bûn. Kesên di avahiya Partiyê de piştepişt bûn. Her kesî digot, em dê li ber xwe bidin. Dilgermiya şêniyê li Partiyê hêdî hêdî cihê xwe ji kîn û hêrsê re dihişt. Piştî gelek hewldanan Waliyê Îzmîtê Memduh Oğuz derkete ser telefona me. Walî, erza me şikand, da ku em careke din telefonî wî nekin. Heta serê sibê me bi vî awayî nobedarî kir. Ji hêla faşîstan ve li derve tim slogan dihatin avêtin. Cam û şibakeyên me ji ber kevirên wan hûr û hela bibûn. Dotira rojê derdora Partiyê mîna mehşerê bû. Faşîstan di bin alîkarî û parastina polîsan de ‘dê û weledên xwe diavêtin!’ Di heman saetan de rêveberên me Ahmet Kaya, Arif Demirkaya û M. Şah Tekin ji cem walî hatibûn. Walî ji wan re gotibû:‘Herin serokê xwe bînin, da ku em çareyekê bibînin.’ Hevalên me hatin Partiyê, ji bo ku em bi hev re herin cem walî. Lewre derdora me hatibû dorpêçkirin, em bi gelek derdorên demokratîk re ketin têkiliyê. Di wê kêliyê de ji nişta ve deriyê me da pehînan, te digot qey erd diheje. Piştî ku derî şikandin û ketin hundir, bi cop û qalasan êrîş anîn ser me. Bi çêr û gefan bi ser me de diqîriyan. Ez birim odeya ku pîrek lê ne û li min xistin. Berçavka min şikandin, dev û rûyê min di nava xwînê de mabûn. Polîs û faşîst ketin hundir û kî kete ber lepên wan, wekî gurên har bi ser wan de çûn. Qîreqîra zarokan û hawara jinan tevlî dengên cop û şikandinan dibûn. Ez bi erdê ve kişkişandim û ji qata duduyan heta jêrê bi vî şeklî birin. Bi pehînan derdiketin ser me û çêr dikirin...”

### Pêkhatina êrîşê.

Belê wisa dibêje Ramazan Bilginer. Bilginer, Serokê HADEP’a Îzmîtê ye. Ew, bi vî awayî li Girtîgeha Ümraniyeyê behsa êrîşa faşîzan a MHP’iyan, ku di 17’ê sermaweza 1998’an de qewimîbû û bûbû sedema şehadeta Metin Yurtsever, dike. 5 ji wan jin, 18 kesên ku ev roja reş dîtibûn, piştî îşkenceyên giran ên 8 rojan îro li Girtîgeha Ümraniyeyê ne. Roja yekem ku wan tînin girtîgehê, bi xebera nexêr dihesin:“Metin Yurtsever şehîd ketiye!”

Ramazan Bilginer dîsa me dibe wê rojê:“Min dît ku gelek kes birîndar in. Gelek heval bêhiş ketibûn û ew radikirin nexweşxaneyê. Em ber bi erebeyên polîsan ve birin. Ez çûm li dawiya erebeyê siwar bûm. Hevalê Metin li cem min dane rûniştandin. Rewşa wî xirab bû, tim dinaliya. Piştî demekê êdî wisa bû ku, em li ser hev rûniştibûn. Metin tim digot ‘Lingên min û pişta min.’ Piştre em pê hesiyan ku parsûyên wî hemû şikestibûn û hestî di dilê wî re çûbûn. Ji ber ku di nav erebê de min bi Metin re xeber da, polîsekî bi porê me girt, kişand û çêr kir. Li emniyetê polîsek hate cem me, navê min, Metin û navê 3 hevalên din xwend ku rewşa wan ne baş e. Lê mudaxaleyeke tibî jî nehate kirin. Peyre em avêtin hucreyên cuda. Heşt rojan îşkenceyên giran li me kirin. Pêşî berê me dane Girtîgeha Îzmîtê, rojek şûn de jî em anîn Girtîgeha Ümraniyeyê. Li vê derê Serokê HADEP’a Stenbolê Mahmut Şakar hate xêrhatina me û ji me re got:‘Bila serê me sax be!’. Wê gavê me fêm nekir, gelo çima wisa gotibû, çi qewimîbû? Çend deqîqe şûn de em pê hesiyan ku Hevalê me Metin Yurtsever di bin çav de hatibû qetilkirin. Çaketê wî bi me re hatibû...”

### Evîndarê azadî, wekhevî û biratiyê bû

Ramazan Bilginer û Metin Yurtsever. Emrê wan li dora 50–55’an e. Bilginer, ji Xalfetiya Rihayê gundê Wahnayê, Yurtsever ji Gêxiya Çewlikê ye. Dostaniya wan diçe 10 sal berê. Beriya xebata HADEP’ê, gelek sal di sendîqeya EĞİTİM–SEN’ê de mil didin hev û hevaltiyeke baş datînin.

Em dixwazin ku Ramazan Bilginer, ji me re qala heval û dostê xwe bike. Gelo taybetiyên wî, rabûn û rûniştina wî çawa bû? Xwedî psîkolojî û hestên çawa bû? Bilginer, wekî bersiva vê pirsê dide zanîn ku Metin şerînê ber dilê piştgirên HADEP’ê bûye. Her wiha ew mirovekî xwîngerm bûye û wey li wî xwestiye ku ji bo Partiyê xebatê bike. Ew, bi doza welatê xwe re eleqedar dibûye. Bilginer pirsa me ya bi rengê: “Rojeke wî li Partiyê çawa derbas dibû?” wiha dibersivîne:“Gelek caran dilê xwe li me digirt, diqehirî. Digot hûn belesebep li vê derê rûdinin.Tim dixwest ku em çalakiyên xurt bikin. Çawa li mala xwe tevdigeriya, li Partiyê jî wisa dikir. Çay çêdikir, tevî ku gelek kesên jê biçûktir li Partiyê rûniştibûn jî, radibû çay belav dikir, se[...] maseyan paqij dikir, xwelîdank vala di[...]kirin. Ne mirovekî qure bû, nefsbiçûk bû. Bi mezinan re mezin bi biçûkan re biçûk bû. Zêde mijûl nedibû lê gava di[...] axivî jî gotinên di cih de digot. Dilşewat û xwîngerm bû. Dema di medyaya derewîn de, ji bo kurdan tiştên ne di cih de dihatin gotin, diqehirî. Çawa ku kurmek ji navê ve wî bixwe pê dihat...”

Dema ku em dixwazin Ramazan Bilginer behsa serpêhatiyeke xwe [...] Metin Yurtsever bike, kesereke kûr dikşîne, kelogirî dibe, piştî sekneke biçûk dest pê dike û dibêje:“Sala 1978’an bû. Roja ewil ku me hev nas kiribû. Ji ber ku piçek boz û zerek bû, min digot hebe hebe ev Gurcî ye. Ez ber bi wî ve çûm û min jê pirsî: ‘Gelo tu Gurcî yî?’ Berê xwe da min, keniya û wisa got:‘Hey malava! Te qet Gurciyê ku bi kurdî mijûl dibe, dîtiye?’ Çiqas kes li wê derê hebûn, piştî vê gotinê ji kena zikopişto bibûn.

Dixwazim behsa serpêhatiyeke din bikim, ku tu car ew jî ji bîra min naçe. Dema em di binçav de bûn, rewşa wî zêde xirab bû. Min jê re got: ‘Tu çawa yî?’ got ‘Ez ne baş im’ lê di wê rewşa xirab de jî digot ‘Heval çawa ne, gelo yên birînxedar hene?’ Vê yekê wê rojê gelek tesîr li min kiribû..”

### “Min ji qata 4’an ew da pişta xwe û anî jêr”

Eyüp Kılıçdoğan xortekî Farqînî ye. Li Îzmîtê boyaxkariyê dike û alîgirê HADEP’ê ye. Ew jî di heman karesatê de tê binçavkirin, îşkence dibîne û tê girtin. Tevî Metin Yurtsever di heman hûcreyê de dimîne. Eyüp Kılıçdoğan jî çend saetên dawî bi van gotinan tîne zimên:“Hal lê nemabû. Te digot qey goşt û hestiyên wî ji hev pelişîbûn. Me dixwest ku li jiyanê vegere. Bi sedan car me li deriyê hesin ê nezaretê dixist lê mixabin tenezûl nedikirin ku berê xwe jî bidin me. Carna dihatin û digotin ‘Tiştekî wî tune ye, qestî dike’. Piştî demeke kin, êdî ji lebat û mijûlahiyê jî ket. Lê me tim li derî dixist. Serê sibê hatin. Pêşî nexwestin ku bibin nexweşxaneyê, piştre biryara xwe guherandin. Ji hûcreyê derxistibûn û avêtibûn binê derenceyan. Ji min re gotin, bide pişta xwe û bibe xwarê. Ji qata 4’an min ew da pişta xwe û anî jêr. Ew siwar kirin û birin. Dotira rojê em anîn Ümraniyeyê. Li vê derê min bihîst, ew kesê ku min doh dabû pişta xwe û li ber sekerata mirinê bû, gihîştiye şehadetê. Sebavan, ew zûtir bibirana nexweşxaneyê, dibe ku îro ew jî li nav me bûya. lê em şaş nabin, neyar e û bêminet e!...”

SALIHÊ KEVIRBIRÎ



Endamê HADEP’ê Metin Yurtsever, di êrîşa MHP’î yan de, ku di 17’ê sermaweza 1998’an li Îzmîtê qewimî de birînxedar bûbû, lê ji ber ku nehatibû tedawîkirin, koçî nav karwana şehîdan bû.

www.arsivakurdi.org

## BÛYERINE JI DÎROKÊ

❑ 13 reşemî 1925:

**Serhildana Şêx Seîd ji Pîranê dest pê kir**

Serhildana Şêx Seîd bi pêşengiya Komîteya Azadiya kurdan dest pê kir. Lê rêveberên komîteyê Yusif Ziya Beg û Xelîl Begê Cibrî berî destpêka serhildanê hatin girtin û kuştin, ji ber vê yekê Şêx Seîd bû serokê fîilî yê Serhildanê. Li gorî planên komîteyê serhildanê wê roja Newrozê dest pê bikira lê haya dewletê ji amadekariyên kurdan hebû. Lewre jî serhildanê bi provakasyonekê roja 13'ê reşemiyê li Pîranê zû dest pê kir.



❑ 18.02.1993:

**Kemal Kılıç hate qetilkirin**

Nûnerê Ruhayê yê Özgür Gündemê û nûçegihan Kemal Kılıç ji aliyê kontrayan ve hate kuştin. Kemal Kılıç li Kulunca Ruhayê roja 18'ê reşemiyê ji aliyê kontrayan ve hate revandin û pişt re hate qetilkirin. Kılıç 30 salî bû û di rojnameya Yeni Ülke de dest bi rojnamegeriyê kiribû. Herwiha wî di nav rêveberiya Komeleya Mafên Mirovan a Ruhayêyê de jî cih digirt.

### Li AÇHK'ê li ser muzîka kurdî platforma nîqaşê:

# Ceribandinên nû û otantîzm

**Hunermendên kurd li AÇHK'ê li ser muzîka kurdî û arîşeyên wê gotûbêjek saz kir. Di gotûbêjê de kesên wekî Xelîl Xemgîn, Diyar, Şemdîn, Cewad, Silêman, Merdan û Hakan axivîn.**



Hozan Xelîl Xemgîn

Li Akademiya Çand û Hunera Kurdî roja 10'ê reşemiyê bi sernavê "Di muzîka kurdî de ceribandinên nû û otantîzm" platformeke nîqaşê hate lidarxistin. Hunermendên kurd Xelîl Xemgîn, Diyar, Şemdîn, Cewad, Silêman, Merdan Zirav û Hakan dîtinên xwe vegotin. Piştî ku hunermend Silêman û Merdan, ku platorm bi rêve dibir dîtinên xwe anîn zimên, beşdarên din axivîn û pirsên mêvanan bersivandin.

Xelîl Xemgîn rewşa huner û hunermendê kurd a kevn û nû nirxandin kir û pêşketinên ku pêk hatine li ber çavan xistin. Xemgîn di pareke axaftina xwe de wiha got: "Ji ber ku dijmin nekarî şoreşa kurdan a li başûrê Kurdistanê vemirîne di warê muzîkê de hindik be jî bingehek bihêz hate damezirandin lê kurdên li parçeyên din ên Kurdistanê ji van bêxeber bûn, sedem dagirkirina Kurdistanê ye. Ji sala 1980 yî pê ve dergehek ronahiyê li ser muzîka kurdî vebû û bû destpêka dîroka nû, her wiha bandora şoreşê bûye sedem ku di navbera hunermendên kurd de yekîtiyek saz bibe."

Hozan Diyar jî girêdayî heman mijarê got ku di muzîka kurdî de, pêşkeftinên li başûrê Kurdistanê girîng in lê rengê muzîka kurdî tê de lawaz e û di bin bandora muzîka erebî de maye. Diyar wiha berdewam kir: "Gerek em li ser koka muzîka gelêrî ya kurdî muzikeke nû çêbikin, lê divê neyê jibîrkirin ku resenî û bingeha muzîka gelêrî qet neyê guhartin. Di roja îro de muzîka kurdî dikare hemdem be û ji muzîka ewropî jî tesîrê bistîne lê ji bo vê jî qanûn û qerar pêwîst in."

Hunermend Şemdîn jî pirsa bi rengê 'çi cudahî di navbera stranên kevn û nû de heye ji aliyê ziman, awaz û neverokê de' wiha bersivand: "Civak di çi rewşê de be jiyana wê civakê, pirsgirêkên wê, têkilî, dan û standina gel bi xwe û bi hev û din re, jiyana sosyalî û çandî naveroka stranê li gorî wê rewşê derdixe holê. Civak her diçe tê guhartin, stran jî li hev zêde dibin, xwe nû dikin û dewlementir dibin. Girîng e mirov ji aliyê zanyarî ve li civakê mêze bike." Diyar li ser cudahiya di navbera strana kevn û nû de jî wiha got: "Ku mirov bixwaze strana nû biafirîne, zanîna zimanê zikmakî pir pêwîst e. Dibe ku ji aliyê teknîkê ve pêşketin hebe, lê dema dûrî rihê awaza strana resen a kurdî be, wê nikaribe berhemên baş û bi naveroka xwe dewlemend biafirîne." Diyar di berdewama axaftina xwe de têrnaverokbûna stranên gelêrî wiha anî zimên: "Gava mirov li stranên gelêrî guhdar dike, awaz û naveroka wan û rêzkirina hevokên wan pir dewlemend in. Mirov dikare bi saetan guhdar bike lê strana nû temenê wê ne zêde dirêj e. Ji bo vê yekê jî divê em berî her tiştî bingeha kilamên xwe yên cur bi cur ên herêmên welatê xwe nas bikin. Piştî vê naskirinê mirov dikare bingeheke zanistî biafirîne."

Ji beşdaran Hozan Comerd jî li ser rewşa muzîka kurdî ku mewalên kurdî di roja îro de gelekî hatine guherandin û bal kişand ser bêkontrolbûna muzîka îroyîn. Comerd wiha got: "Pêwîst e ku hunermendên me li ser muzîka klasîk a kurdî rawestin, lê mixabin di vî warî de lêkolîn tune ye."

Hunermend Merdan jî der barê nirxên neteweyî ku strana kurdî jî yek ji wan e wiha got: "Ew kesên ku bi nirxên neteweyî ku di dirêjahiya dîrokê de hatine afirandin bilîzin dibin sedema kuştina gelekî. Ji ber ku hebûna gel dîrok, folklor, stran û çanda wî ye."

Süleyman Gültekin jî di beşeke axaftina xwe de li ser girîngiya jiyana hunermend di erdnîgariya wî de sekinî û got ku kesê li welatê xwe û bi zimanê xwe yê zikmakî bê perwerdekirin dikare baştir li ser muzîka xwe ya neteweyî raweste.

Semîner bi bersivandana beşdarên platformê ya pirsên mêvanan bi dawî bû.

**KAK Ş. ORAMAR** /BERLÎN

## ÇAVDÊRÎ

# Xweseriya Serok



MIRHEM YIĞIT

Serok hê bi cîh nebûye lê bi gotinên Theodoros Panglaos "ew bûye melekê pîroz, ew li her cih û her deverê ye." Tirk jî qîreqîra wan û hewarhewara wan e, çi dibêjin bila bêjin, êdî çerxa zemên li dijî wan digere û salên li pêşiya me dê bibin salên serketina me û binketina wan.

Serokayetî û girêdayî wê apoyîbûyîn ji zû de bûye xet û sîstemek. Ketiye jiyana kurdan, bûye malê çend mezheb û olan, dibe kultur û mora xwe li perwerdekariya çend cîl û nifşan dide. Bi tenê bûyerên van hersê mehên dawî, qewimînên ku di wan de bûn û bahoza ku li welêt û li derveyî welêt rabû bes in ji bo mirov li ser vê rastiyê bibe xwedî fikrek ê. Gelo partî, şexsiyet an jî xwedîgotinekî kurd maye ku serok bi awayekî ji awayan wî mijûl neke? Her meyil û tevgereke kurd rasterast an jî nerasterast di bin bandora sarokayetiyê de ye. Ev sal bi sal eşkeratir û xuya dibe, pesin û qebûleke firehtir digire.

Bandora dîtin û ramanên Platon li ser zemanê pişt xwe çendî bikêr be û bi gotinên A.N. Whitehead çawa "giş felsefeya Ewropa ji hejmarek jêrenotên Platon pê ve ne tiştekî din e." Analîz û şîroveyên siyasî jî ku bi îmzeyên siyasetmedar û rewşenbîrên kurd têne kirin ji sedî sed bi nisbetekê bêhna Apoyîtiyê ji wan tê. Dijmin vê dibîne, dizane û ev e sedema serekî çima berê giş lopên xwe li Serok rast dike: "Me stratejiya xwe bi tenê li ser tiştekî ava kiriye: Bihêzkirina gurûbên li dijî Öcalan". (Şenkal Atasagun musteşarê MİT'ê)

Wezîfeya welatparêz, xwenda û û rewşenbîrên kurd çi ye, ew çendî hayîdarên plan û stratejiyên dijmin in? Bi taybetî rewşenbîrên kurd di vê qonaxê de pêwîst e gelekî nişmî û guhdîk bin, gavên xwe bi fikir biavêjin, gotinên xwe bi berpirsiyariyeke mezin bikin û wiha çavgirtî, yan jî di bin bandora bêhnikeke hêrsbûyî de tiştên ku dê sibe lê poşman bibin, dê bi kêrî dijmin bên, dê ji aşê zordaran re bibin av, îmze nekin. Îro ji her carê zêdetir hewcedariya me bi rabûn û rûniştineke neteweyî, bi helwest û yekdengiyeke temam û xurifkirina rêzên welatparêzan heye.

Ev bila tim di bala me de be: Neteweyek çendî li paş mabe, di nav pirs û pirsgirêkên dîrokî, kulturî û kesayetiyê de çendî teqinîbe, çendî hatibe ber xenaqê û bêhn lê çikiyabe, hişmendiya wî çendî dejenere, berevajî, mesex û bermeqlûb bûbe, ew çend jî hewcedariya wî bi serok, şervan, qehreman û rewşenbîrên xwedî prensîp û bi biryar çêdibe. Serokekî wiha heye, qehreman û şervanên wiha jî çêbûne, gelê kurd jî îro ji berê gelekî li pêştir û organîzekirîtir e. Dimînin rewşenbîr. Di vê eniyê de jî guhartin çêdibin, ev enî jî dê teqez rojekê barê xwe baştir hilgire û zû yan dereng dê li xwe werqile.

Serok xwe bi xwe aniye îro, ew ji her serokekî din zêdetir xaliqê xwe û mamosteyê xwe ye. Wî otorîte û prestîja xwe ji kesî negirtiye, pişta xwe nedaye tu kesî, ji xwe û ji gelê kurd pê ve. Wî hem di zaroktiya xwe de, hem jî di xortanî û jiyana heta îro de di nav dijwarî û tengasiyan de xwe nas kiriye, stewiyaye û bûye ev hêza roja me. Şert û mercên Kurdistanê, bêbavî û bêperwayiya dijmin, nebûna dostan û bêdengiya cîhanê serok kiriye xwediyê hin xislet û dirûvên xweser, jê re bûne xurtî, şarezayî. Ne ev xweseriya heralî; eskerî, siyasî, rewşenbîrî û dîplomatîkî bûye mercên bêwijdan dê ew ji zû de di salekê ji van salên heta niha de bitevizanda. Ev xweserî ye ya ku heta niha bûye parêzgeh û zirx ji serok re.

Giş jiyana serok û nemaze jiyana paş Romayê vê dibêje: Rewş û tiştên serokên din diperçiqînin, wan teslîm digirin û wan dibin secdê, Serok berztir dikin û hinekî din kûrayî û mezinahiya wî derdixin.

www.alsinakurdi.org

## Çîroknûs Suzan Samancı:

# Min divê ji bo hemû dilan binivîsim

***Di van salên dawîn de her çend di warê maf û rewşa jinê de pêşketinek pêk hatibe jî, hîna tenetiya jinê berdewam e. Digel vê yekê tenetiya di warê wêjeyî de jî gelekî dijwar e. Piştî ku hûn di warê wêjeyê de gihîştin astekê, tenetiya we rengekî çawa wergirt?***

✻ Avahiyên binesazî, demokrasî û mekanîzmayên din ên civakê çendî têkûz bin, wê kesayetiya ferdan jî wisa xurt û kemilî be. Çawa ku derûniya kesan heye, derûniya civakan jî heye.

Ger em werin ser pirsa jinan. Bi rastî jî ji mêj ve ta îro jin her tim bindest e. Em dikin sedsala 20'an li pey xwe bihêlin lê hîna jî rewşa jinê gelekî aloz e. Têkiliya jin û mêran hîna jî sererast nebûye. Li Îngilistanê, ku wekî welatekî pêşveçûyî tê binavkirin, li gorî lêkolîna Rosalin Couwart, jinên ku zaningeh birine serî jî, hîna di bin nîrên civaka kevneşopî û serdestiya mêran de dipelixin. Ez di warê azadiya jinê de, ji bo erdnîgariya me Mezopatamyayê, ku ev serê sedan salan e bi hêstir û xwînê tê avdan, di nava xemxuriyeke dijwar de me. Lewre ji bo ku mirov bikaribe azad û serbest bijî, zanabûn û têgihiştin pêwîst e. Azadî ne di bêrîka mirov de ye. Di riya wê de ked û xebat divê. A girîngtir divê mirov azadiya derûnî binase.

Tenetiya di warê wêjeyê de jî rastiyeke ku her li dar e. Her ku mirov bikemile û bi pêş de biçe, dibe dîlê tenetiyê. Lewre her ku asta zanyarî û hestyarî ya ferd bi pêş dikeve, nakokî û nelihevî dikevin nava ferd û civakê. Li ser vê yekê Nietzche dibêje:" Tenêtiya mirovê pêşketî û şareza ne wekî tenêtiya kesekî ji rêzê ye. Ew tenêtiyeke hêja û bikêr e."

> Ez zêde ne miroveke sosyal im lewre pir nagerim. Bi baweriya min divê kesê nivîskar asosyal be. Ez zanîn û karîna xwe ya wêjeyî ji pirtûkan û derdora xwe ya teng hiltînim. Peyre di bêndera binhişîna xwe de gêle dikim, di parzûnê hêmayê de disefînim.

***Ew çi bahoz bûn ku berê hespê we da warê dijwar a wêjeyê? Ev helwesteke jinane ya bi zanabûn e?***

✻ Ev pirs gelekî tê arastekirin. Ji pênc zarokên mamosteyekî ya herî mezin im. Jiyana me li sirgûnan bihurî. Ew rewş û derûniya xeribiyê, hîna jî di binhişîna min de birîneke xwînî ye. Di çîrokên min de rêç û nîşaneyên nefîbûnê berbiçav in.

***Nivîsîn, têhndaneke derûnî ye. Ku mirov hay ji vê têhndanê bibe, wê bi aramî û biryardarî vê yekê bi pêş bixe, hebe tunebe wê hin tişt pêk werin. Li dibistanê min gelekî ji dersa edebiyatê hez dikir. Nivîskarên ku navê wan dihate hildan, delalê ber dilê min bûn. Min digot: "Gelo ew mirovên dûrî aqil û rastiyê ne.?"***

✻ Wekî diyar e, mirov her dem doza xweşikî û jidiliyê dikin, min jî bi vê armancê dest bi rêstina helbestan kir. Piştî ku di warê helbestrêstinê de hinekî kemilîm, ez tê gihiştim ku derûniya min û tevna nivîsîna min bêhtir li pexşanê tê. Di vê serdemê de ez bûbûm bengiyê karûbarê nivîsînê. Peyv li nav mêjiyê min li hev dixin. Destê sibê bi hêma û remzan ji xewê hişyar dibûm. Min pala xwe dabû pirtûkan. Bi pirtûkan sebra min dihat. Piştî ku berhemên min têr naverok bûn, hêdî hêdî berhemên min di kovarên wêjeyî yên bi navûdeng de hatin belavkirin. Êdî min biryara xwe ya misoger girt û ez li karûbarê nivîskariyê hûr bûm.

Wêje û huner di heman demê de serhildan e. Ango li dijî sîstemê û hemû cure neyiniyan, bi deskeftinên hestiyarî serî rakirin e. Huner ji hemû neyiniyan fikar dike û peyre jî destnîşan dike. Mirov ji bo mirovan vedibêje. Huner, çi ji civakê hiltîne wê lê vedigerîne. Huner, rêberê mirovahiyê ye. Pêşawayê derûnî ye.

***Gelek nivîskarên cîhanê, bi hêza mezin û karîger a hunerê, doza sererastkirina çewtiyên civakê û têkiliya mirovan kirine û bi roleke girîng jî rabûne. Vê qêrîna mirovane, nivîskarên li Kurdistan û Tirkiyeyê çendî dadaye?***

✻ Çapxane, piştî ku hate afirandin, li dû du sed salî li vê erdnîgariya hate bikaranîn. Civaka Tirkiyeyê her tiştê nû di pey re şopandiye. Lê şopandina wê jî bi rengê zarîkarî û teqlîdê ye. Bi vî awayî tu tişt naçe serî. Geşedan û kemilîna mirov, dagerîn û pêşveçûn di heyamên azad û serbest de pêk tên. Dema civakek li reseniya(orjînalîte) xwe venegere û bi vî awayî doza pêşketin û nûjeniyê neke, dê ji hev bikeve.

Ger em werin ser rol û erka hunermendan, ew bi helwesteke dîdaktîk nikarin tevbigerin. Fêrkirin peywira zanist û zanyaran e. Ger hunermend bi vê xem û sawê tevbigere, wê demê têk çûye. Huner û wêje li derûniya mirov dikole û wê diguherîne.

***Baş e. Nivîskarên ku siya xwe berdabin rengê hubra pênûsa we kî ne?***



*Suzan Samancı di 20'ê rezbera 1962'an de li Amedê ji dayik dibe. Dema 3 saliyê malbata wê ji Amedê koç dike, dema ew 15 saliye jî carekedin vedigere Amedê.*

*Pêşî çîrokên xwe di bin navê "Şev Dihele Diçe(1991)" de dicivîne û bi derfetên xwe çap dike. Peyre "Bêhna Gezo ji Hêlînê Dihat (1993)" û "Çiyayên Qerax Berf Girt (1996)" derdiçin. Samancı, di sala 1997'an de di Pêşbirka Xelata Çîrokan a bo Orhan Kemal de di nava 65'an berheman de xelata rêza duyemîn wergirt. Wê bi pirtûka "Bêhna Gezo ji Hêlînê Dihat" ev xelat wergirt.*

*Ev berhema Samancı bi navê "Bajarê Mirinê" bi kurdî hate weşandin. Her wiha bo almanî, flamanî û spanî jî hate wergerandin. Dîsa pirtûka "Çiyayên Qerax Berf Girt" jî wê bo swêdî bê wergerandin. Ew, niha li nivîsîna romaneke hûr bûye.*

*Suzan Samancı, ji bilî karûbarê nivîskariyê karê kevaniyê jî digerîne.*

www.arsivakurdi.org

**Ez ne tenê û Hêlînan ji bo kurdan dinivîsim. Divê ev yek bi rengekî din neyê şîrovekirin. Min divê ji bo hemû cîhanê û dilan binivîsim. Her nivîskar berhema rewşa civakî ye. Herêma xwezayî ku ez lê dijîm, çi dabe min, ez dê bi karîna xwe ya afirandinê vê yekê raber bikim. Ji vê yekê pêştir ez nikarim tiştekî binivîsim.**

∗ Bivê nevê nivîskar ji berhemên derçûyî sûde werdigire û tesîra wan lê dibe. Ji kaniyên cur bi cur avê dikişîne. Şertên em tê de dijîn, rasteqiniya mirov, erdnîgarî, reng û bêhna me, her cure tişt tesîrê li mirov dike.

Nivîskarên ku bi hezkirin dixwînim ev in: Marquez, Carlos Fuentes, Lawrence Durell, Çexov, Michelle del Castillo. Ji bilî van, helwesta Albert Camus a ji bo hîçbûn û serîhildanan, berxwedana wî ya li Fransayê, ku çawa wekî ferdekî piştgiriya gelê bindest ê Cezayirê kiriye, gelekî tesîr li min kir. Ji edebiyata tirkî jî du nivîskarên girîng hene ku dengê xwe ragihandinê cîhanê. Orhan Kemal ku nivîskarekî postmodern e û Yaşar Kemal ku xwediyê stîleke vegotina epîk û lîrîk e. Van her du nivîskaran tesîreke mezin li min kiriye. Ji çîroknivîsên tirk jî Vüs'at O. Bener, Sabahattin Ali û Sait Faik diecibînim.

***Heya îro gelek rexne li berhemên we hatine kirin. Hûn van çawa dinirxînin?***

∗ Berî her tiştî min divê vê yekê bînim ser zimên: Ger rexne bi qaretî û helwesteke şexsî were kirin, ew ne rexne ye. Li ser navê rexneyê divê sinyal ji kesayetiya nivîskar re neyên şandin. Rexne, bi tevahî diyarkirina aliyên baş û nebaş ên berhemê jî nîn e. Ango tu rabî, wekî xoxekê bikî du felq jî nîn e. Divê ev were pêşkêşkirin: Va ye tovê wê ev e. Kakila wê wiha ye. Reng, bêhn û tama wê wisa ye. Bi vî rengî û şêweyekî alînegir divê taybetiyên berhemê bide xuyakirin.

***Divê pêşî li rexneyê neyê girtin. Lewre rexne, tevgereke sererastkirinê ye.***

∗ Belê wisa ye. Lê belê divê rexnegir jî çek di dest de wekî nêçîrvanekî li kemînan negere. Her wiha divê nebêje: "Min li yekê xist, va ye ez ev im." û bi vî rengî rexneyê ji bo belavkirina navûdengê xwe nexebitîne.

Civakên ku mekanîzmaya rexneyê rast bi kar neyînin, bi rastî jî bi jihevketin û têkçûnê re rû bi rû dimînin. Li aliyê din nivîskar û rexnegir bêyî hev nabin. Her du jî hevdu xurt û şarezatir dikin.

Min divê vê yekê bidim xuyakirin. Min ji rexneyên neyinî bêhtir ên erênî girtine. Gelek kovarên wêjeyî yên serketî û navdar behsa şahîkî û nûjeniya zimanê min dikin û dibêjin, ew bi şêweyekî edebî zimên bi kar tîne. Ev yek min îdia nekiriye 'va ye min tiştek kir.' Jixwe dema nivîskar tiştekî wisa bibêje, wî xwe hetikandiye.

***Hûn nivîsên xwe ji rengê dilê Hêlînan dirêsin. Dilê wan ê ku tê şewitandin û koçberkirin. We divê bi vê yekê çi raberî Hêlînan bikin?***

∗ Dema ez radihêjim pênûsê, ez ne tenê ji bo Hêlînan û kurdan dinivîsim. Divê ev yek bi rengekî din neyê şîrovekirin. Min divê ji bo hemû cîhanê û dilan binivîsim. Her nivîskar berhema rewşa civakî ye. Herêma xwezayî ku ez lê dijîm, çi dabe min, ez dê bi karîna xwe ya afirandinê vê yekê raber bikim. Ji vê yekê pêştir ez nikarim tiştekî binivîsim. Di vê serdemê de ez nikarim bêjim min ev tişt daye Hêlînan. Wê peyre diyar bibe. Ger zanabûna hunerî ya dilê Hêlînan bikemile, wê ew pê bitamijin.



***Çima di nav civaka me de nivîskar evqas kêm peyda dibin?***

∗ Barê te bi qasî çiya û baniyan giran e. Tenêtî heye. Tu dibî hedefa tîran. Ne jiyana te ya taybet ne jî ya gelemperî dimîne. Zelzeleyeke derûnî ya dijwar heye. Piştî ku mirov gihişt radeyekê nema dikare vegere. Êş e, jan e. Tenêtî heye. Bi derdorê re lihevnekirin heye. Ango tu her tim di nava pozberiyê de yî. Xemgînî heye. Divê ev yek li ber çavan were girtin.

Bala xwe bidê, ji nava civaka kurdan, gelek siyasetmedar û kesên ku li ser siyasetê dinivîsin radibin. Gelo çima wêjenas û nivîskar ewqas hindik in? Bi çend gotinên sloganîk, bi naverokeke têrnegihiştî qaşo şoreşgerî hêsan e. Lewre ji bo nivîsîna edebî, zanabûna hunerî, felsefî û helbestî divê. Ango zanîn û karîneke têr û berfireh divê. Tu mecbûr î ku her tim bixwînî û fêr bibî. Her wiha divê tu her dem bala xwe bidî ser jiyana nûjen. Xwedê û ferişte bi mirov nadin nivîsandin. Berhemdarî û afinêrî barekî giran e û bi kedeke mezin pêk tê. Ez jî dipirsim: Çima kurdên ku bi karûbarê siyasî radibin, ewqas kêm dixwînin?

Va ye mirovên serketî û zana her dem darî çav dibin. Li hemberî kesên bi rengî di nava civakên bindest de antîpatî û çavnebarî rû dide. Em hîna jî dikevin taya etîket û payedariyê. Em zanabûna pîşeyî û ya giştî tevlihev dikin. Dema em li nik zanebûna pîşeyî, zanebûna felsefî, wêjeyî û pîvanên jiyana nûjen wernegirin, em dê wê demê bibin bûnewereke dîrokî. Bi baweriyan min gelê kurd dikare bi wêjeyê nexweşiyên xwe derman bike.

***Hûn dikarin hinekî behsa jiyana xwe ya rojane bikin? Li Amedê jiyan çawa dimeşe?***

∗ Ez zêde ne miroveke sosyal im lewre pir nagerim. Bi baweriya min divê kesê nivîskar asosyal be. Ez zanîn û karîna xwe ya wêjeyî ji pirtûkan û derdora xwe ya teng hiltînim. Olanên ku ji derdora min digihên min; dengek, qêrînek, bêhnek, tiştên ku dibihîzim. Vê rasteqîniyê ji wan peyda dikim. Di bêndera binhişîna xwe de gêle dikim, di parzûnê hêmayê(imge) de disefînim. Dawiyê jî bi metirsî û xemxuriyeke estetîk a hunerî dinivîsim.

Jiyana li Amedê... Amed ketiye ber bagera koçberiyê. Li her derê kêşa însanan. Şewat, mirin, windabûn û heta qirikê hejarî û xizanî. Dema tu derkevî kolanan, bi rengên xwe, bi bêhna xwe wê ev atmosfer were raçavkirin. Çavên mirovên afirîner wekî objektîfa wênekêşan in. Yekser rûdan û diyardeyan tomar dikin. Her cure sînyalên ji cîhanê têne wergirtin, di zanabûna mirov de guherînên girîng pêk tînin. Ev, wekî brûskekê di dilê mirov de diçirîqe. Va ye, hûn vê rasteqiniyê hiltînin û di deryaya xeyalên xwe de dihonin. Heye ku ev dibin huner û diherikin.

ROŞAN LEZGÎN/ AMED

***Gelê kurd bendewar û dilxwazê zimanê xwe ye. Lê hûn wekî kurdekê bi zimanekî din dinivîsin. Hûn dê bi vî awayî çendî bikaribin vê hêviya gelê kurd pêk bînin? Di vî warî de berpirsiyariya nivîskar çi ye?***

∗ Ah... ah...ah. Hûn jî çawa di cih de vê tîra amade diavêjin min! Destnîşankirina vê rastiyê gelekî dijwar e. Hûn dibêjin "zimanekî din". Ev serê hezar salan e ku em û tirk bi hev re dijîn. Her wiha ez dixwazim vê yekê bidim xuyakirin. Ez nikarim bibêjim: " Ez hez ji zimanê tirkî nakim." Lê ji ber ku ez nikarim bi zimanê xwe yê zikmakî binivîsim, ez gelekî pê diêşim û stuxwar im. Ev ji bo kesekî/ê tiştekî pir dijwar e. Her wiha ev tiştekî sosret e. Min divê li vê derê gotineke Albert Camus bi lêv bikim: "Dema civakên mêtingeh bi zimanê xwe binivîsin, ew wekî ku bang li dinyayeke ker û lal kirin e. Dawiyê li ber destê wan, zimanê serdestan dimîne."

Ger îro ez nikarim bi zimanê xwe binivîsim, ev ne sûcê min e. Gotin hêsan e. "De binivîse!" Tu dibêjî qey va ye di bêrîka min de ye, ez pêşkêş nakim. Ev ne tiştekî hêsan e. Ez bi kurmanciya gelêrî dizanim lê ev ji bo nivîsîna berhemekê têrî min nake. Lewre bi zimanekî nivîsîna berhemên wêjeyî karekî dijwar e. Çima? Ji ber ku kanî û jêderka nivîsînê binhişîn û derûniya mirov e. Divê di binhişîna min de her tişt bi kurdî bihata honandin û min xewnên xwe bi kurdî bidîtana. Ango divê min fonetîka kurdî bi dest bixista. Piştî peydabûna van yekan, nivîsîn karê rîtm û ahengê ye.

Piştî vê yekê ku ez çendî lê bixebitim jî û zorê bidim xwe jî, heye ku nivîs ango berhem bi kurdî be lê dawiya dawî dê bibe werger.

***Baş e. Berpirsiyareke me ya bi kurdî nivîsînê nîn e? Ku wêje bi kîjan zimanî tê afirandin, dibe malê wî...***

∗ Belê. Em berpirsiyar in. Bi vî rengî: Ev problem bi tevgera civakê re girêdahî ye. Bi firotina çend pirtûk û kovaran ev xebat naçe serî. Zimanê kurdî hîna jî nîv qedexe ye. Wêjeya me ya nivîskî ewqas bi pêş neketiye. Ji ber çewsandin û qedexekirinê nekemiliye. Wêjeya nivîskî tiştekî wisa ye ku mirov divê her dem lê bê xebitin û bikolin.

Di vê hêlê de tawanbarkirina nivîskar û rewşenbîr hêsan e. Di vî warî de hîna nû bingehek peyda dibe. Tov tên çandin. Ev tov wê di nava atmosfereke guherbar de werin gubrekirin û avdan. Peyre wê ev şitl, ber û fêkî bigirin. Ev yek wê di pêvajoyekê de werin pê. Pirî caran li ser vê mijarê wekî zarokan dikevin qirika min.

***Ev hêvî û daxwaza gel e. Gel mafdar e ku hêvî û daxwazên xwe ji nivîskaran bixwaze. Gelo gotina "wekî zarokan" çiqas di cih de ye?***

∗ Tune wî...! Ango dema neyê nivîsin jî divê kes neyê tawanbarkirin. Nivîskar bi xwe jî parçeyekî civakê ye. Ew jî di nava wê "drama lengûîstîk (karesata zimanî)" de ye. Dil û mêjî bi nakokiyan mişt e û di nava alozî û kaosê de dijî. Di binyata xwe de ziman, ol û nijada wêjeyê tuneye. Her wiha dema hûn rewşa ku gelê we tê de dijî vebêjin û ew bi gelek zimanan were xwendin, li wê derê pirsa zimên ji holê rabûye. Bes naverok û kakil dimîne.

# Bûka Biharê: Agirbanû



Xêz: Dîlên şer yên PKK'yî yên jin

Îşev heta sibê
Li ser welatê Ariyan
Ji esmanan
Nameyên berfê dibariyan

Devdevî sibê
Agirê adarê
Mîna bûka biharê xwe xemiland
Û berê xwe da
Ber bi qada pakrewanên
Bi navûdeng û bi huner û çand

Karker û girtî
Zar û zêçên birçî û tî
Daristan û gundên şewitî
Û hemû penaber û koçberên qewitî
Di asoyê de qor bûn
Bi ramûsanê şêrîn û çepikê gir
Ketin şopa bûka baranê
Herikîn serbajarê êgir

Bûka biharê
Roja bîst û yekê adarê
Ligel temaşevan û guhdarê xwe
Derket hizûra pakrewanan

Wan jî wiha got:
-Bûka biharê
Ji vê êvarê şûn de
Bila navê te yê nû
Bibe Agirbanû

İLHAMİ ÖZER

### "ORKÊŞ"

di helbestekê de
navê te pir xweşik bû
di nav gulan de veşartibû
li ber navê tey şêrîn
gotinên helbestê tev direqisîn, dimestiyan
har dibûn, xwe diavêtin kolanê bajêr
li bin tîrêjên ronahiyê
di bin çipa çipa baranê de
xwe kom dikirin li ber deriyê te
şev digiriya li ber dora mala te

di şanoyekê de
tu xewnek bûyî
li ber çiyayên Omeriyan
ezê te bişînim ezman
ez im xewna xwe
û yê bi leylanê re baz dide
parwanek im, dişewitim
li ber dîwarên te
ji bilî qermîçokan tiştekî çênakim
bes di guhê te de ban dikim
yan ez yan ew

di romanekê de
ez hozanekî pir biçûk im
pesnê şîka xwe didim
bajaran dişkînim di nav tiliyên xwe de
heyvê dikizirînim di ezmanê dilê xwe de
kî ye dildarê te?
çi ye bişkivandina porê te?
tu şoreşek e li ber pirîskên te dişewitim
û kes nizane sirûdan binivîse
ji germahiya te re
êvarek im li tîrêjê ronahiya te dipilpilim
ji tevzînokan dibim aşek
ji bilî tozê tiştekî nahêrim
wek kalekî bêhêvî li devê dikanan
kofiya xwe dikim nîşana xerîbiyê
erê şînga te nîşanek e
ne "fişeka" dilê min re ye

di muzîkê de
ezê nifira Zerdeşt li te bikim
Mîdya

ÎSMAÎL KOSE/AMÛDÊ

### Tu qet rûniştî û fikirî gelo?

Tu qet rûniştî û fikirî gelo?
dema dest bi fîrê dike çivîk
çiqas dilxweş û şa dibe
dayika wê/wî
- Ez pê şa dibim.

Tu qet rûniştî û fikirî gelo?
mirovek bêkar
dema dibe êvar
çima bi dilek şikestî û stuyek xwar dihere mal
- Ez pê xemgîn û dilşewat im.

Tu qet rûniştî û fikirî gelo?
dema xeberê şehîdbûna
zarê wê yê gerîla tê
çima bi tilîlî dest bi şînê dike
dayika wê/wî
- Ez bi wan serbilind im.

Tu qet rûniştî û fikirî gelo?
çima êgir bi bedena xwe dixin
keçên xama xortên jîr
ku hîn di destpêka jiyanê de bûn
- Ew kulîlkên şoreşê
Mizgîniya azadiyê ne.

Ger bersivên te
Bi erênî
Û soz dabe xwe
Ku bişopînî
Rêça wan
Tu jî endamekî/e êdî
Ji koma bijarte
Ên mirovan

BERKEN BEREH

### Xaka me winda nabe

Hawarên bêdeng bila lal bibin
Birînên bênalîn bila pûç bibin
Nêrînên bêhêvî bila kor bibin
lê dîsa em
ji kurdîtiya xwe danakevin!
Xewnên welatê me
ji xwînê bi jîn bûne..!
Mayînên jêrerdî
Di xaka wî de dîn bûne....!
Dewsa wan tev bûne
Sosinên azadiyê...
Aştî lê hate çandin
Zikreşî jê hilandin...
Sondek me heye!
Di asîmanê te de xuya ye
Di nav Xak û Bayê te de
me berdaye
Di bin baskê aştîxwazan de
me pêçaye...
Ew sond jî!
Welatê me ye û
Kurdîtiya me ye...
Nêrînên çavên me
bi pêlên deryayan
û rewrewkên asoyên dûr
hatine xemilandin
Bi wan nêrînan re
Emê gulistanan
Di bin siya rojan de
biçînin û geş bikin
Erd û ezmanê welatê xwe
biparêzin...
da ku winda nebe
û xwîna me ziwa nebe
çiku ew xwîn
ji vîna xaka vî welatî ye!
û pêwîst e
ev xak ziwa nemîne...
Da ku dêmê rojê
bi ken li me derkeve
û êşa birînan
ji nû rakeve....!

BÊWAR ÎBRAHÎM/ QAMIŞLO

### Agir

Ji min re helbestekê binivîsin
Bila ji êgir be
Stranekê bêjin
Bila ji êgir be
Destanekê bixwînin
Bila ew jî ji êgir be
Ji min re agirekî bînin
Bila helbest be
Bila stran be
Bila destan be
Bila jiyan be

HARBİ SOYLU

www.arsivakurd.org

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Navenda Çanda Mezopotamyayê ya Stenbolê

- **13.02.99 şemî:** Konsera Koma Rojhilat li HADEP'a Beykozê, saet:13.00
- **14.02.99 yekşşem:** Konsera Koma Agirê Jiyan li HADEP'a Tuzlayê, saet:13.00

NÇM'ya Îzmîrê

- **13.02.99 şemî: Konferans:** "Nêziktêdayîna dîrokî ya pirsgirêka neteweyî" Alattin Damar, saet:14.00
- **14.02.99 yekşem:** Konsera Koma Tofan "Heval", saet:17.00
- **19.02.99 în:** Konsera Koma Agirê Jiyan "Adarê", saet:18.00

YÇKM

- **13.02.99 şemî:** Filmê 'Qutîka Muzîkê", saet:16.00
- **14.02.99 yekşem:** Konsera Koma Muzîkê ya Vardiya ya Beksavê, saet: 17.00
- **19.02.99 în:** Filmê 'Berdêla Azadiyê' Lîstikvan: Michael Colins-Liam Nelson saet: 19.00

T.H.K.M.

- **14.02.99 yekşem:** Barbara û înternasyonalîzma proleterya. Beşdar: Muammer Ketencioglu, Ozan Merwan (NÇM)... saet:15.00

# Li kolanan şano



Koma Teatra Yekbûn a Navenda Çanda Mezopotamya şaxa Edeneyê ku di sala 1993'yan de hatiye avakirin û xebatên xwe li şaxê didomîne, ev demek e, li kolanên Edeneyê lîstika xwe pêşkêş dike. Wekî tê zanîn salona çalakiyan a NÇM'ya Edeneyê jî hatibû morkirin û hîn jî ji lidarxistina bernameyan re girtî ye. Koma Teatra Yekbûn, ji 12 kesan pêk tê.

Koma Tetara Yekbûn ji destpêka sala 1999'an vir de, li gelek taxên Edeneyê li kolanan lîstika bi navê "Şert" pêşkêşî gel kir û hîn jî li taxên cur bi cur tê pêşkêşkirin. Lîstika bi navê "Şert" ji aliyê Koma Teatra Jiyana Nû ya NÇM'ya Stenbolê ve hatibû lîstin. Koma Teatra Yekbûn, xebat li ser vê lîstikê kiriye û bi şêweyekî nû pêşkêş dike. Lîstika bi navê "Şert" jiyana gelê kurd a xizan û belengaz li ber çavan radixe û her wiha nêrînên mêrên kurd ên kevneperest ên li hemberî jinê jî tîne zimên.

Di lîstika bi navê "Şert" de bi tevahî pênc kes dilîzin, yek jê bûrokratekî kurd e ku rastiya xwe înkar dike û her wiha bi pergalê ve girêdayî ye. Yek ji lîstikvanên din jî di rola sekretera wî de dileyize. Yên din jî sê mirovên gundî ne.

Ji ber ku di lîstikê de rewşa yên gundî gelekî kambax e, diçin cem bûrokratê bi navê Selîm Beg û daxwaza kar dikin. Lê xwediyê kar, bi du şertan kar dide wan. Şertê wî yê yekem ev e, dibêje: "Ka hela bê hûn çiqas bi hêz in, hunerê xwe nîşanî min bidin." Lê bûrokratê dewlemend qîma xwe tenê bi vê yekê nayne û wiha dibêje: "Ev tiştê ku hûn bi hêza xwe dikin, teknolojî wê bi hêsanî dike." Li ser vê yekê ji ber ku hersê zilam gundî ne û nezan in, hema hersê bi hev re bi awayekî matmayî dibêjin "teknolojî!? belê em wî baş nas dikin. Ew mirovekî gelekî baş e." Di lîstikê de dor tê ser şertê duyem û bûrokrat wiha dibêje: "Ji bo ku ez karekî bidim we, divê hûn gelekî ji jinên xwe bitirsin." Ew hersê mirovên gundî vê yekê napejirînin û li hemberî vê yekê derdikevin. Paşê jî poşman dibin û dîsa bi çend derewan xwe dipesinînin. Lê dîsa jî bûrokratê tolaz tu kar marî nade wan û ew xeyalên wan di avê de diçin.

Di berdewama lîstikê de hersê mirovên gundî mineta bûrokratê tolaz hêç dikin û dev ji karxwestinê berdidin.

Di lîstikê de tenê di dawiyê de bi kurtayî bi çend gotinan balê dikişînin ser têkoşinê.

### Nêzîktêdayîna gel

Dema lîstika şanoyê ya bi navê 'Şert' li kolanan dihate pêşkêşkirin gelê kurd wekî pêkenok dinirxand. Diyar bû ku gelê kurd gelekî ji şanoyê dûr e. Mînak, li gorî lîstika şanoyê divê di nîvê lîstikê de li çepikan neyê xistin û divê bi bêdengî li lîstikê bê guhdarkirin. Ji ber ku gel ji jiyana şanoyê dûr e, rexneyan li şanogeran nagire. Lê dîsa jî ji ber ku ji aliyê Navenda Çanda Mezopotamya ve berhemek wiha tê pêşkêşkirin ji aliyê gel ve gelekî tê ecibandin. Pêşkêşkirina vê lîstikê hîn jî li taxên cur be cur berdewam e. Di lîstikê de kêmasiyên şanogeran di warê bikaranîna zimanê kurdî de xwe dida der. Ji ber ku şanoger hemû baş bi zimanê kurdî nizanin di lîstikê tengasiya bikaranîna peyvan dikişadin. Mirov dikare bi saya vê lîstikê derbarê jiyana jina kurd de dibe xwedî hin agahiyan. Di nav mal de ji teşîristinê heta ku tevlî refên şoreşê dibe serboriya jina kurd berbiçav dibe.

**FATÎH BENDEWAR** /A.WELAT EDENE

## TÎŞK



# Hewlekanî gorankarî le Irak û kurd

BEKIR ŞIWANÎ

Salî 1990 be dagîr Kuweyt le layen hêzî supay Iraqewe, qeyranêk berpa bû ke ta rojî emroş dirêjeyheye û hemîşe le helçûn û tawsendin da buwe. Lem qonaxe da geyştiwe be xalî teqînewe û serle niwê le asoy nawçeke da hewrîçikilkinî şer bedîdekrê. 8 sal sepandinî gemaroy abûrî beser Iraq da ke wekû rêgaçareyek bo lawaz kirdinî deselat lew welate û rûxandinî peyrew kira, le ciyatî ziyangeyandin be rijêm û lawaz kirdinî, bû be hoy gul kirdinewey azad û meynetiyekanî gelî Iraq û gelî başûrî Kurdistan.

Emerîka, be dirêjayî mawey diway tewaw bûnî şerî kendaw, siyasetêkî rûn û bercestey nebû derheq be Iraq. Herweha le beranber kêşey kurdîş le başûr bêçare mayewe. Washington sereta siyasetî goşegir kirdinî Iraq û Îranî peyrew kird. Belam Hatine ser karî M. Hatemî le Tahran û hewldan bo encamdanî gorankarî le siyasetî nawxo û derewey Îran da, bû be hoy ewey Emerîka eger bo maweyekîş bê, gûşar leser berey Îran kem bikatewe ser Iraq.

Iraqîş lay xoyewe hate ser ew bawerey ke lîjney taybet be lenawbirdinî çeke kokujekanî Iraq (UNSCOM) amade niye xalêk bo karekanî piçkinîn dabinê. Bexdad pêy waye ke Emerîka deyewê le rêy UNSCOM'ewe dirêje be gemaroy abûrî bidat ta ew katey rijêm le Bexdad lawaz debê û deruxê. Tenanet hendê le endame hemîşeyekanî encumenî Asayişî ser be Netewe Yekgirtiwekanîş le siyasetî Emerîka derheq be Iraq û le karî lîney UNSCOM kewtine gumanewe be şîweyek ke êsta Rûsiya daway dest le kar kêşanewey Richard butlerî serokî lijneke dekat. Diway hêrşî asmanî mangî dîsemberî rabirdû, Emerîka be aşkira raygeyand ke têdokoş bo gorînî deselat le Iraq. Em helwêste niwêyey Washington leser astî nawxoy opozisyonî Iraq û welatanî herêmeke, giftufoyekî zorî hênaye arawe ke ta êsta berdewam e. Be taybet dabîn kirdinî birêk hawkarî le layen kongrêsî Emerîkawe bo hêzekanî opozisyon, lay hendê dewruber be destêwerdanî Emerîka le kar û barî nawox Iraq le qelem dedrê û heman ew dewruberane beşêk le balekanî opozisyon be nokerî kirdin bo Washington tawanbar deken. Bem core opozisyonî Iraq ke le bineret da pert û bilaw e û le çendîn girûp û deste û taqimî nateba pêk dê, leber em hoyane naypejête ser yekxistinhi rîzekanî bo encamdanî gorankarî çaweruwankiraw le Iraq. Hoyekî tirî perş û bilawî opozisyonî Iraq, xulanewey balekanêtî le xulgey dewletanî herêmeke da, wek deşzanrê paytextekanî dewletekanî dirawsêy Iraq, her yekeyanbe corêkî ciyawaz xewn be deselathi dahaûy Iraq'ewe debînê. Balekanî opoziyonî niştecê lew dewletanî herêmeke berjewendî xoyan dexene serûy berjewendî gelî Iraq û gelî başûrî Kurdistan.

Herçende ke layenî kurdî le başûrî Kurdistan niwênerayetî bizutnewey rizgarîxwazî gelî kurd dekat, lem qonaxe da krokî opozisyonî Iraq pêk dênê. Belam leberewey opozisyonî Iraq bernameyekî rûn û aşkiray niye bo dahatûy Kurdistan, wa pêdeçê layenî kurdî le helwêst û biryarî siyasî opozisyon be gûan bêt û seray hewlekanî Emerîka, kurd be dudilî legel opozisyon da hawkarî dekat ewîş eger le bineret da hawkarî hebêt le nêwan da. Kewate rêknekewtin leser çarenûşî gelî kurd le başûrî Kurdistan, hoyekî tirî yek negirtinî opozisyonî Iraq e.

Eger opozisyonî Iraq êsta lem katî lawazî û bêdeselatiye da dan be mafe rewakanî gelî kurd da nenê, ey başe gerantî çi ye bo ewey ke diway hatine ser deselat be agir û asin pelamarî Kurdistan nadat? Be awirdanewe le ezmûne tale hawbeşekanî kurd û hukumete yek le diway yekekanî ıraq, em metirsiye ziyatir debê.

www.arsivakurdi.org

## *Ji Herêma Serhedê kilamek:*

# "Çûro û Fesîhê Mihê Mîrze"

*Le Axaooooohey lawo axao min got di berxîtiya xwe de têr nemijiyaoo, di kavirtiya xwe de têr neçêryayo-o, di pazdeh saliya xwe de bû firar û qeşqûrê mehkûmê serê dax û çiyaoo. Birincî bi Feyso re, îkincî bi Şêxo re, uçincî bi Berxê Mala Seydo re geriyayo. Sala çil û yek salê te qediya li Dirbêspiyê li Xeta Sûrî li cem Mala Haco ma, sala çil û yek salê te qediya efûya te derketî te berê xwe da Welatê Serhedê, kurmancên Hesenan xayîn bûn, li ser "Zozanê Dexda" li "Goma Xelef" ji Fesîhê lawê Mihê Mîrze; Mêrikê Mêrxas, Melkemotê Kûlê, Kûpê Xwînê çima nehewiya axaoooo.*

*Axaoo sibe ye, dilê min ê ji dila, dila dibîne, maqûlo dilê min ê ji dila, dila dibîne. Fesîhê Mihê Heyderî li ser nazbalgiyê rûniştiye, temamê giregirên Hesenan li dorê rûniştine, qala êsîrtiya xwe li Xeta Sûrî dike, ji cemeeta dora xwe re dibêje bavo, pê re dinikine.*

*Fesîh bi sê denga li Eshedê lawê xwe kir qêrîn e: Eshedo lawo! tu rabe lez bike bilezîne, Bozê li tewlê derîne, teng û bertengê Bozê çep û rast bijidîne. Destê xwe bavêje Bêşliyê bi tevî qolê fişeka ve deyne qarşî bavê xwe vezelîne. Ezê berê xwe bidime Zozanê Dexda Goma Xelef Kaniya Mihê, kûla Zozanê Dexda Goma Xelef Kaniya Mihê; kûleke giran e. Bavê te bimire, bila hefse di dilê bavê te de nemîne lawoooo..... Hehîhîîîîîî*

*Eshed bi sê denga li Fesîhê bavê xwe kir qêrîn e, dibê: Bavo yeqîna te bê ji Xaliq Rebê Alemê, Qurana Nebî ne ku bavo rûknê dîn e. Mêrxasekî li Welatê Serhedê rabûye jê re dibêjin; Çûro, Kekê Îlyas Bavê Dirşayê, bavo li Erdê Kavirê dimîne. Ev sala hefta ye ketiye sala heşta Zozanê Dexda, Goma Xelef, Kaniya Mihê bi darê zorê ji me distîne, koç û kêriyê xwe bavo, tê diçêrîne.*

*Fesîh, bi sê denga li cemeeta dora xwe kir qêrîn e, Dibê: Gelî cemeeta hazir ezê dûayekê ji rebê xwe bixwazim, hûn bi hev re bêjin amîn e. Belkî Xaliq Rebê Alemê tu car belayê wisa li pey mêrikê mêrxas nexîne.*

*Fesîh lez dike, dilezîne, Hespê Bozê ji tewlê dertîne, teng û bertengê Bozê çep û rast dijidîne, destê xwe davêje Bêşliyê bi tevî qolî fişeka ve datîne qarşî bavê xwe, diwezîne. Ma berê xwe da Zozanê Dexda Goma Xelef Kaniya Mihê koç û keriyê Çûro Kekê Îlyas Bavê Dirşa ji Zozanê Dexda dertîne. Kaxizekî dinivîsîne li destê Başxûlamê Çûro datîne. Dibê: Çûro tu bidî xatirê Xwedê û Qurana Nebî ne, tu qetl û qitûlê bi min nekî, ji nava çil û çicûxê min careke din ê lawo, berê min li Xeta Sûrî nezivirîneeeeeee axaooo. Lawo tu bi Şera Mûhemed bêjî, li ber te sekinî me. Heger tu bi orfê dikî, gazî çar alî miqûfa bike, Zozanê Dexda heşt qetih e, bila qethekî her wiha bê pol bê pere ji te re bimîneeeeîîîîî. Heger tu wê yekê nakî; kifş û raporê derxe, Zozanê Dexda bi kifş û raporê ji min bistîne. Lawo Zozanê Dexda, Zozanê bav û kalê min ê qedîmî ne êêêêê. Hey axaoooooo haêêêîîî*



*Lê belê roj qameta nîvro berê koç û keriyê Kekê Îlyas Bavê Dirşayê, Başxûlam li nava malê diqelibîne. Çûro bi sê denga li Başxûlam kir qêrîn e. Başxûlam kaxizê bi destê çûro Kekê Îlyas Bavê Dirşayê datîne. Lê gava Çûro kaxizê dixwîne li nava serê xwe kir qêrîn e. Dibê: Lawo Zozanê Dexda zozanê zorê, zozanê me re tapû û qoçanê bavê kesî jî, ji zozan re tunîne.*

*Emo, bi sê denga li Dirşa qiza xwe kir qêrîn e: Dirşa lawo tu rabe lezke, bilezîne, xwe bi aliyê odê bigihîne, deriyê odê li taqa piştê bixîne. Bi sê denga li Çûroyê bavê xwe bike qêrîn e. Bêje bavo dayika min li berbanga sibê razaye, sê xewnê xirab dibêje, bavo ji te re dîne. Dibêje berê xwe nede Zozanê Dexda Goma Xelef, pêsîra xwe nede pêsîra Fesîhê Mihê Mîrze, mêrikê mêrxas, melkemotê kûlê, kûpê xwînê, dibêje bavo çûna te bi dawet e, yeqîn hatina te ji me re bi şîn û girîn e. Dirşa dibêje bavo were em herin looooooooo.*

*Lê bala xwe bidê, Dirşa lez dike dilezîne, derê odê li taqê piştê dixîne. Bi sê denga li Çûroyê bavê xwe kir qêrîne e. Dibê bavo tu bidî xatirê Xwedê û Qurana Nebî ne, tu were destê xwe ji benda kuştinê bikşîne. Dayika min Emo ji berê berbanga sibê razaye, sê xewnên xirab bavo ji te re dîne. Dibê berê xwe nede Zozanê Dexda pêsîra xwe nede pêsîra Fesîhê lawê Mihê Mîrze, mêrikê mêrxas, mêrê têr, melkemotê kulê, kûpê xwînê, dibêje bavo çûna te bi dawet e, yeqîn hatina te ji me re bi şîn û girîn e. Dirşa dibê bavo tu were em herin loooooo.*

*Lê belê Çûro li nava serê xwe, li Dirşa qîza xwe kir qêrîn e. Dibê: Dirşa lawo wezîfa qîza min ne ew e, wezîfa qîza min ev e; rabe lezke bilezîne, hespê bavê xwe ji tewlê derîne. Ji te re enexdar, bismilah bike li devê çekmecê bixîne, bi sî û du qolê fişeka ve deyne qarşî bavê xwe wezîne. Bavê te li Welatê Serhedê mêr li qarşê xwe nedîne. Dayika te Emo ehmeq e, nezan e, aqilê wê nagire, bila êvarê derkeve hafa Siwarê Hesenan Fesîhê Lawê Mihê Mîrze, êsîr û destgirêdayî, bila li pêşiya bavê te bibîne lêêêêêêêê....*

*Dirşa lez dike dilezîne, vê tedbîra hanê ji bavê xwe re dibîne: Çûro ji malê siwar dibe, bi sê telaqê Emo sond dixwe. Dibê: Herçî li ser Zozanê Dexda pêsîra xwe bide pêsîra min zilamê, xêrê ji xêr û bazara xwe nabîne. Dê Xaliq Rebê Alemê pelê wî ji darê biqetîne, xenimê xwe li ber çavê xwe bîne, xêrê ji vê bazara xwe nabîne axaoooooohaîîîî*

*Axaooo sibe ye ezê bi Zozanê Dexda diketim sê karî ne. Ji siba Xwedê ve Çûro bi serê Fesîh ve bavo, qîreqîr e. Axaooo sibe ye wezê bi Zozanê Dexda diketim bi kerkora derdora Fesîh bi sê denga li Çûro kir qêrîn e, dibê: Çûro lawo tu bidî Xatirê Xwedê û Qurana Nebî ne, tu qetl û qitûlê bi min nekî, ji nava çil û çicûxê min, lawo careke din berê min li Xeta Sûrî li cem Mala Haco nezivirîneeeeee....*

*Lawo Zozanê Dexda, Zozanê bav û kalê min ê qedîmî ne, heqê kesî di zozan de tunîne. Lawo tu bi şera Mihemed bêjî li ber te sekinîme. Tu yê gazî çar heb alî miqûfa bike Zozanê Dexda heft qetihe ye, bila qetheke ji te re bê pol û bê pere bimîne. Heger tu vê yekê qebûl nakî, kifş û raporekî derxe, bi kifş û rapora hikûmetê Zozanê Dexda bavo ji min bistîne looooo-oo...*

*Lê bala xwe bidê Çûro qet xebera dinlemîş nake, ji siba Xwedê ve hê jî li serê Fesîh de hê qîreqîr e. Lê dixe kevirê ber serê Fesîh dişkîne, kozikê bi ser serê Fesîh ve bavo, diweşîneeeee. Dibê lawo Zozanê Dexda Zozanê me ye, zozanê zorê ye, tapû û qoçanê bavê te jî, ji Zozanê Dexda re tunîne. Heger tu bi hikûmetê bi min re xeber bidî, geleke serê min jê naşî. Hikûmet li pêşiya bav û kalê min nîne. Mamûrê hikûmetê van e, li navbeyna min û qarşî wezilîne. Ezê vê sibê ji malê siwar bûme, bi sê telaqê Emo sond xwariye. Herçî li ser Zozanê Dexda pêsîra xwe bide pêsîra min zilamek, xêrê ji vê bazara xwe nabîne. Xaliq Rebê Alemê pelê wî ji darê diqetîne. Axaoo axhaîî*

......Her çiqas Fesîhê Mihê Mîrze dixwaze xwe ji hevz û belayê biparêze jî, bi ser nakeve. Ji ber ku di salên derbasbûyî de, Fesîhê Mihê Mîrze ji Pazdeh saliya xwe heta çil û yek saliya xwe ji ber "Mêrkuştinê" tam bîst û şeş sal ji nav malbat û zarokên xwe dûr, li "Xeta Sûrî" li cem "Mala Haco" wekî qaçax û firar dimîne. Divê em di vê navberê de bibêjin ku Fesîhê Mihê Mîrze ne bi tenê "Mêrkuj" e. Her wiha gava ew dibe "Xwînî" û derdikeve serê "Dax û çiyayan", Serhildana Şêx Seîd têk çûye. Seranserê Kurdistanê bi leşkerên Roma Reş tijî bûye. Ango leşker derketine "Nêçîra Serhildêran" Di mehkûmî û qeşqûriya xwe de, di laqîbûneke leşkeran de "Teslîm" nabe û berê "mîrata elemanê" dide leşkeran û çend ji leşkeran dikuje. Piştî vê qewmînê, serûvena Xeta Sûrî û Mala Haco dest pê dike. Bîst û şeş sal li "Binxetê" dimîne. Piştî ku "Efûya Giştî" derdikeve, dizivire tê li ser mîrateyên bav û bapîrên xwe ango tê Welatê Serhedê. Lê vê carê jî bela li dorê diçe û tê. Çûroyê bavê Dirşayê çav berdaye zozan û gomên Fesîhê Mihê Mîrze.

Fesîhê Mihê Mîrze, herçend mêr û mêrxas e jî, naxwaze bela biqewime û dîsa firarî û qaçaxî bibe para wî. Gelek caran ji civata dora xwe re dibêje "Ezê duayekê bikim, hûnê bêjin 'Amîn' Duaya wî jî ev e: "Xaliq Rebê Alemê tu car belayên wisa li pey mêrikê mêrxas nexîne!"

Lê Çûro belayeke gewr e. Bi tir e, bi tinaz e. Mêr û mêrxasan li ser xwe nabîne. Jina wî Emo tevî ku xewnên giran û xirab dîtiye û keça wî Dirşayê, nikarin Çûro ji vê çavsorî û bitiriya wî dagerînin. Piştî ku lê dixe kevirê ber serê Fesîh dişkîne, kozikê bi ser serê wî de diweşîne, Fesîhê Mihê Mîrze êdî xwe hew digire û dibêje: "Êdî bes e ev zilm û zora te" û berê mîrata "Bêşliyê" dide Çûro bavê Dirşayê û ser û mêjiyê Çûro belav dike û wî li erdê direxîne...

BERHEVKAR: M. SALİH TAŞKESEN

www.arsivakurdi.org

# Hejmara 6'an a Vateyê derket




Kovara bi zaravayê kirmanckî Vate gihîşt hejmara şeşan. Di vê hejmara kovarê de kesên têvel, li ser mijarên wekî dîrok, ziman û çandê, nivîs û hevpeyvîn pêşkêş kirine. Her wiha hinek çîrok, serpêhatî û helbestan jî ji xwe re cih dîtine.

Bo nimûne, Memo Darrêz bi wêjenasê faris Cafer Cafernêjad re li ser Sadêq Hêdayet hevpeyvînek kiriye. Di vê hevpeyvînê de li ser şêwaza romanên Hêdayet û naveroka berhemên wî agahiyên balkêş cih digirin. Her wiha li ser felsefeya wî jî tê rawestandin. Her wekî tê zanîn Sadêk Hêdayet di wêjeya Îranê de xwediyê cihekî taybet e. Bi taybetî romana wî ya bi navê "Kundê Kor" li gelek zimanan hatiye wergerandin. Mirov dikare bi alîkariya vê hevpeyvînê li ser Hêdayet bibe xwedî agahiyên berfireh.

Malmisanij di vê hejmara kovarê de li ser kirmanckiya motkiyê rawestiyaye. Hinek xisletên vê devoka kirmanckî bi devokên din re hatiye rûberkirin. Piştî ku beşa ravekirin û rûberkirinê qediyaye, nivîskar du çîrokên bi vê devokê û ferhengokek jî pêşkêş kiriye. Mehmet Uzun di çîroka xwe ya bi navê "Yelge" de qala seydvaniya kewan dike. Haydar Diljen jî bi nivîsa xwe ya bi navê "Eke kurdî pê fam nêkenê, şima çirê kurdkî qedexe kenê?" rewşa piştî çûna Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bo Romayê nirxandiye û bersiva spekûlasyonên li ser zimanê kurdî daye. Di vê nivîsê de tê xwestin ku kurd yekîtiya xwe xurt bikin û rewşenbîr jî barê ku dikeve ser milên wan hilgirin.

Di vê hejmara kovarê de nivîseke balkêş jî ji aliyê Mûnzûr Çem ve hatiye nivîsandin. Di vê nivîsa bi sernavê "Komara Tirkiya û Dêrsim" de li ser polîtîkayên dewleta tirk ên pişaftin û qirkirinê tê rawestandin. Çem, bi taybetî balê dikişîne ser rengê nasyonalîstiya tirkan û têkiliya di navbera nasyonalîstiya tirkan û almanan de. Ew wekî sedema înkarkirinê û jixwehesibandinê lawaziya çand û toreya tirkî nîşan dide. Li gorî nivîskarê vê nivîsê ji ber ku çande ke tirkan a xurt tuneye, dest avêtiye talankeriyê.

Memo Darrêz di nivîsa xwe ya duyemîn de li ser standardîzekirina zimên dîtin û ramanên xwe derpêş kirine. Di nava nivîsê de li ser teoriyên der barê mijarê de jî agahî hatine dayin. Kesê ku di nava vê hejmarê de du nivîsên wî cih girtine, ne tenê Darrêz e, her wiha Malmisanij jî bi du nivîsan di vê hejmarê de beşdarî kiriye. Malmisanij di vê hejmarê de ferhengeke kirmanckî û tirkî pêşkêş kiriye.

Di dawiya kovarê de nameyên xwendevanan cih girtiye. Ji van nameyan yek bi hin taybetiyên xwe ji yên din vediqete. Kesê ku ev name nivîsiye bi xwe kurmanc e, lê bi kirmanckî nivîsandiye û li ser biryarên ku di kovarê de li ser zaravayê kirmanckî têne weşandin dîtin û ramanên xwe pêşkêş dike. Ji bilî van nivîsan, helbestên kesên mîna J. Îhsan Espar, Xecê, Mîkaîl Aslan, Fırat Çelkerî, Deniz Gunduz, Abdulmuttalip Koç di nava rûpelên vê hejmara kovarê de cih girtiye.

SERWÎSA ÇANDÊ

# Welat û hemwelatî

HASAH KAYA



Tu rojeveke cihê tune be jî, bi serê xwe mehên nêzî biharê bi xwe re germî û tevger, xebat û lebatekê tînin. Tevî coşiya van rojan, di rojeva civaka kurdan de, qewmînên bi heyecan jî hene. Projeya serokê gelê kurd, a ku ji Romayê da dest pê kir, xebatên damezrandina Kongreya Neteweyî û hilbijartinên ku dê li Tirkiyeyê û bakurê welatê me çêbibin, rojeva me germtirîn dikin.

Bi tena serê xwe mirov nikare van qewmînan binirxîne. Hem bi tena serê xwe ne, hem jî cihê ne. Bandorê jî li hev dikin. Ji ber vê rojeva çalak, nîqaş, sohbet û afirandina teoriyan jî zêde bûye. Her kes li gorî xwe dozînekê vedibêje. Ez bi xwe niha nakevim nav van teoriyan.

Ez dixwazim di vê nivîsa xwe de hinekî li ser qewminîneke nûjen rawestim. Di gelek nîqaş û sohbetên rû bi rû û yên nivîskî de, ez rastî daxwazeke mirovên ku xwe PKK'yî nabînin hatim. Hinek ji van mirovan dibêjin, tevî ku em hemû ramanên wê naparêzin jî, em dixwazin di hilbijartinan de piştgiriya HADEP'ê bikin. Hinek ji wan dibêjin, di pêvajoya Romayê de pozê me jî şewitî, piştî lînçkirin û kirinên din ên dewletê.

Li gorî min dîtinên van kesan tiştên nû ne, di civaka me de. Lewre heta îro hemû kes û rêxistinên ku xwe wekî hevalbendên PKK'ê nedidîtin, li hemberî dewletê û ligel Tevgera Azadiyê cihê xwe diyar nedikirin. Îro wekî destpêkê jî be, di gelek civînan de, bi taybetî jî beşek ji rewşenbîrên ku dibêjin em bêalî ne dibêjin, "hemû barê têkoşîna azadiyê bi giştî PKK'ê hilgirtiye. Ji îro pê ve kîloyek be jî divê ku em jî hilgirin."

Helbet bêhna însaf û wîjdanê ji vê şora jor tê. Bi xwediyê/a vî mantiqî re dikare bê rabûn û rûniştin. Bi mirovekî/e ku xwediyê feraseteke wiha be re têkilî dikarin bêne danîn û xurtkirin. Bi ya min mafê mirov û rêxistinên ku bi vî awayî bifikirin heye ku bibêjin gerîla gerîlayê me ye jî, televîzyon a me ye jî, serok serokatiya me ye jî. Bi ya min divê ku ev kes û rêxistin bikaribin bibêjin Înstîtuya Kurdî, Akademiya Kurdî, Rojnameya Özgür Politika û saziyên din ên me ne jî; em dixwazin vî mafê xwe bi kar bînin. Divê ku tu mirov ji tam û çêja xwedîserokbûnê, hemwelatîbûnê bêpar nemîne. Nîmet û awantajên gelê me, divê ji bo hemû hemwelatiyan bin.

Heta ji saziyên me tê divê ku vê guherînê bibînin û li gorî wê xwe saz bikin. Ev karekî zor û zehmet e. Îro barê neteweyekî, heta mirov dikare bibêje ku barê du sê neteweyan li ser milê saziyên me ye. Êdî serok serokê her hemwelatî ye. Êdî saziyên me ne bi tenê yên fraksiyonekê, du frakisyon û çend partiyan in.

Yê ku ev sazî damezrandina û heta îro anîne, dikare wan pêş ve jî bibe. Lê mixabin di sa karê van kes û rêxistinên ku xwe bêalî dibînin û dibêjin em hatine guhartin dijwartir e. Çunkî ew bêtir hînî standinê û girtinê bûne. Hînî dayinê, hînî berdêlê nebûne. Em dizanin ku li tu deverên cîhanê hemwelatîbûn mift û beleş nîn e. Kedek, berdêlek, peywirek jê re divê. Li hin welatan, çûyina leşkeriyê, dayina bacê, girêdana bi sembol, nirx û hêjayiyan ve, çend şertên hemwelatîbûnê ne.

Heke ne bi vî awayî be, ne tama welêt û ne tama hemwelatîbûnê heye. Çiqas mirov peywira xwe ya hemwelatîbûnê bi cih bîne, welat ewqasî şên û ava dibe. Welat çiqas xweş û rind be, mirov ewqasî tê de serbilind e.

Li hemû deverên cîhanê yek ji şertên bingehîn ê hemwelatîbûnê jî, dayina rayê ye. Lê hema bibêje hemû gelên cîhanê azad in, herkes di welatê xwe de azad e û raya xwe dide partiyekê. Ey hemwelatiyo! Bi taybetî jî Rewşenbîro ! Ji bîr neke ku welatê te ne mîna welatê tu kesî ye; tu ne tu kes î. Tu raya xwe bide welatê xwe. Heke HADEP qels bibe xesara wê li we ye jî. Lê heke xurt bibe, Kongreya Neteweyî jî dê li cîhanê û Tirkiyeyê bandora xwe rind bide xuyakirin. Lewre ev mijar ji hev ne cihê ne.

www.arsivakurd.org

# Cihê bûkê li ser serê me ye

Şêniyê gundekî Bedlîsê pir safîk e. Rojekê li gund dawetek li dar dikeve. Dawetvan li ser serê bûkê hineyê digerînin. Dema bûkê tînin mala zavê, şekir diavêjin ber zarokan, lê cêr di destê zarokekî de ye. Zarok jî destê xwe dixe hundirê cêr, da ku şêkir derxe, lê destê zarok di hundirê cêr de asê dibe û dernakeve. Gundî tev li hev dicivin, dibêjin: "Emê destê zarok çawa ji cêr derxin?"

Gelekî lê difikirin û dibêjin: "Çare tune ye. Emê destê zarok jê kin!" Kêrê tînin ku destê zarok jê kin, bûk dike hawar, cêr digire, li dîwêr dixe, cêr dişikê, destê zarok derdikeve û ji jêkirinê xelas dibe.

Dawetvanî dibêjin: "Bûka me bi keramet e, divê em qîmetê wê bizanibin. Cihê wê li ser serê me ye."



Kindirekê tînin, davêjin beştê(kêran) xênî. Kindirê dikin stûyê bûkê û wê ber bi jor dikişînin, bûk bi ser serê wan de dikeve. Zava tê, dikeve hundir, dibêje: "Kanê bûk?" Dibêjin: "Bûka me bi keramet bû, me cihê wê li ser serê xwe çêkir." Zava diçe lê dinêre bûk hişk bûye.

### Te kezeba min peritand

Rojekê Tahir ji bo mêvaniyê diçe mala hevalekî xwe. Hevalê wî jê re kezebê çêdike. Rojtira din Tahir diçe qehwê. Hevalê wî jî li qehwê ye. Di nava civatê de hevalê wî dibêjê: "Tahir, ew kezeba ku min da te çawa bû?" Tahir dibêjê: "Baş bû. Tema wê hîn jî li ser zimanê min e. Xwedê ji te razî be." Rojtira din dîsa li qehweyê dipirse, Tahir dîsa dibêjê: "Baş bû. Xwedê ji te razî be!" Rojeke din û rojeke din dîsa dipirse, Tahir mêze dike jê xelasî tune ye, diçe qesab kezebeke din dikire û diçe qehwê rûdinê. Hevalê wî jî tê, civat şên dibe.

Hevalê wî dîsa dibêje: "Tahir ew kezeba ku min da te çawa bû?"

Tahir radibe ser xwe û dibêje: "Ew kezeba ku te da min serê te bixwe! Xwedê ji te ne razî be! Kezeba ku standibû, ji tûrik derdixe û li ser û çavên wî dixe û dibêjê: "Te kezebek da min lê te kezeba min peritand û te kezeba min ji pozê min derxist!?"

### Şertê îslamê şeş in

Rojekê Xalê Îhsan û diya wî Pîra Sakîne li mal rûniştibûn. Danê esir Sakîne dibêje: "Kurê min bû esır." Îhsan dengê xwe nake û li radyoya xwe guhdarî dike. Diya wî dîsa dubare dike, dibêje: "Kurê min esir e, dema nimêjê ye." Ew hîç dengê xwe nake, lewre kilama wî ya ku jê hez d[…] ke di radyoyê de tê strîn. Diya wî dî[…] bang lê dike: "Kuro ma deng nayê te! E[…] dibêjim bû esir mele bang da." Ew dî[…] dengê xwe nake. Li ser vê diya wî diqehi[…] û dibêjê: "Hey kurê filehan! Ez dibêji[…] meleyê esir bang da." Îhsan radyoya xw[…] digire, bi hêrs radibe ser xwe, tiliya xw[…] radike, cardin dibêjê: "Ne haya min jê h[…] ye, ne dizanim û ne jî ez dixwazim pê b[…] zanibim!"

Diya wî lê vedigerîne: "Hey fileh! T[…] yê herî cehennemê!"

– Ezê herim bihuştê.

– Tu yê bi vî halê xwe biçî bihuştê?

– Çima? Çi bi halê min hatiye?

– Şertê îslamê çend in? Ger tu vê niz[…] nibî tu yê herî dojehê!

– Ma qey ez nizanim? Şertê îslamê şe[…] in.

Diya wî dikene û dibêje: "Ka te pê d[…] zanibû. Bêhişo! Pênc in, pênc.

– Na şeş in.

– Ka bijmêre.

Îhsan dijmêre û bi zor pênc heban r[…] dike.

Diya wî dibêjê: "Fileh! Wele tu bûyî f[…] leh û tu yê herî cehennemê. Ma ka te g[…] şeş in."

Kurê wê dibêjê: "Ma qey tu pê nizan[…] ya şeş an keleş û du jerjûr in."

BERHEVKAR: METÎN EW[…]

## BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (159) XAÇEPIRSA



### Bersiva Xaçepirsa 157'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 159'an Pirtûka Torî 'Med imparatorluğu sonrasında kürtler' e

**Jêrenot:**

*Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.*



**Pênc kesên ku xelata 157'an Pirtûka 'Sam zal ve oğlu Rüstem' qezenç kirine ev in:** Nuri Turan/İzmîr, Habib Turan/İzmîr, Bereket Ağdaş/Mêrdîn, Mehmet Turan/Riha, Cemal Çiya/Enqere.

Baş. çê – Pevajo – Tîpa yekemîn – Ziman berepaşkî – Xususî 'D' were pêşî dibe sewalek – A di – Bi tirkî hundir – Hîmdar, kurucu – Bi taybetî – Beyreq – Vînî – Hêlîn – Şehîdek çapeme niyê wêne – Tîpek – Darek – Karamsar – Tîpa dawîn – Asîman – Tîpek – Dayîk – Kesî pêdi viya wî/ê bi avê heye – Çatı – Tirî lê çê dibe – Navekî mêran – Roşan – Tîpa dû q'yê – Kesê jiyana wî/ê bi dawî dibe – Cinavka yekemîn a pirjimar – Komeke zimanan – Dewleteke ciran – Geçici – Bi farisî av – Dengdêrên cot'ê – Sewalek – Paşgirek – Pêkanîn, kirin – Kevnar – Bersiva neyênî – Tîpa dû m'yê



PEYVA VEŞARÎ 1 2 3 4 5 6

# Reyraşiyayinê azadî dewam keno

Kurdan merg û azadî kerdo cêbey xo ûşiyayînê xo dewam kenê. Di enî şiyayînî de her çiqas komploy dewam kenê jî, zeg yeno vînayîn go kurdî şiyayînê xo yê azadî de bi ser bikoy.

Di dîrokey şaran heminan de şiyayînê azadî esto. Dîrokey kurdan jî pirê şiyayinê azadi yê. Di enî şiyayinê de kurdan zehf zor û zehmetî dî û dîroke de xeynî serawedayîn nika, heme serawedayînî hamey tefîyayîn, vernî heme rayraşiyayînan hamew girotin.

Di serawedayîno peyîn de ke hema hema her roj bi xurtbûne dewam keno û raver şino, verî di serey 1970'yan de dest ker ci. Eno reyraşiyayîn roj bi roj raver şî û di serey 1978 de di Fîs de gamêke pîl û zehmete eyşte. Şiyayinê Azadî xo vera da teberê welatî û xo ewca ant pêser û di 1984 de demo ke serdestan vatê jû kes nêşkeno verê ma serê xo berz kero, gamêkewa bîne eyşte û dest bi şerê çekdarîn kerd. Dimay ene gam eyştine ra her wext de li ver Serokê şiyayînê Azadî suîkastî dewam kerdî.

Dimay seranê 1990 şerî xurt bî û di enî xurtbînê şerî de bi waştinê dewlete adirbirnayînî viraziyay. La di enî adirbirnayînan de suîkastî û şerê xurtî jî dewam kerdî.

Di 1998 de reyna fermandaranê tirkan waşt ke Serokê Şiyayînê Azadî adirbirnayîn virazo. Reyna adirbirnayîn viraziya û di wextê adirbirnayînî de, di 9'ê kewçêrî de suîkastêke bîn hemver Serokê Şiyayinê Azadî viraziya, la semedo ke Serokê Şiyayîna Azadî no komplo vernî de fam kerd, Rojhilato Miyayîn re veciya û şî Îtalya.

Reyraşiyayîno bi zehmet dewam keno

Di dîrokey şaran de jî zey yeno vînayin, şiyayînî, ya bi serkewtin vecênê ya jî bi binkewtin. Di dîrokey şarê Çînijan de bi namey "şiyayino Derg" şiyayinêk esto? Eno şiyayinê Çînijan di serey 1930'î de hetêkey welatî ro dest keno ci û heto bîn ê welatî ra vecêno. Di qedênayinê şiyayinî de gelêke leşkerê Mao jiyaney xo kenê vinî la belê şiyayîn bi serkewtin yeno qedênayîn. Reyna şiyayinê Hz. Mihemedî jî esto ke Mekke ra koçê Medîne keno. Şiyayînê Mele Mistefa Berzanî jî dimay tefîyayînê Komarey Mahabadî de bi des hezarî însananê xo şino Oris. Reyna Che, Castro û embazê xo jî kunê şiyayinê ke, heta resenê koyanê xo Siara Mestra. Gava resenê ewca vanê: "Ma qezenc kerd." Serokê Şiyayînê Azadî jî bi qomloya 9'ê kewçêrî ra şi Îtalya. Eno şiyayîn jî qasê şiyayînanê bînan bi zehmet bî. Di enî şiyaşî de kurdan bi Serokê xo dir merg û azadî kerde cêbey xo û reyra şî. Komplo hûtebî. Xeta qebûl nêbine. Xetaykewa qickeke bîne sebebê derbe werdinê Şiyayinê Azadî, yê kurdan. Bi enî şiyayinî ra kurdan henî rind, zilmê dewlete ke nêwazena kurdî nefes bigirê, dî. Bi no vînayînî ra kurdî zehftir hamey pêser. Karê Kongreya Neteweyî zêdey di serî bî, niyameyne pêser. La bi enî şiyayinî ra zehftir hamey pêser û semedê virazînê Kongre kararî girotî. Her çiqas ke şiyayin heta nika bi ser kewto jî kompoyê navneteweyî dewam kenê. Semedê şermezarkerdinê nê komployan xwepêşandanê kurdan di Ewrûpa de û Kurdistan de dewam kenê û zek yeno vaten go xwepêşandanê kurdan bi awayê cuda cuda dewam bikrê.

Dinya de çawey şiyayinê şaran bi zor û zehmet bî û di qedênayinê şiyayînî de bi ser kewtî, zey yeno vînayîn Şiyayînê Azadî yî kurdan bi zor û zehmet o, la go no şiyayinê kurdan jî bi ser bikoy.

CEMİL ANDOK



# Pawitîna weşîna kesan û şaran rûmet a

Welat de dapîrê ma estbi, her gi fin qeçanê xoyên ke şoreşgeran rê wina vatê: "Lo lawo şima jî vanê qey ke, na dewleta Rom qisanê rindey ra fam kena.. La wili şima xo xapaynenê. Na dewlet bêterteley qe rayê jî nêdawo ma ver. Sey seran ra nataiyê ma qir kenê. Ê bêkor û lecî qe çiyê ra jî fam nêkenê. Înan her gi fin jî ebi ma kay kerdî. La belê eza awnena ke şima yê ebi rindeya û ebi aştî ya nêzdiyê înan benê. Na raya şima yê ma înan ra biresnê. Rindey biyo belayê sereyê ma, na vatena min de xo vîr mekrê."

Wexto ke ma ewnenê rojewê ewroy ra, raşteya nê qisanê dapîr tayna verniya ma kena zelal. Çimke îradeyê kurdan se keno nêkeno, dewleta Rom verpersê aştî û biratey nêdano. Wa verpersê na waştina hemdem kiştê de vindro, ê bandorê zulmî tayna kenê vêşî. Vanê: "Mayê kokê kurdan biyarê û bifetesnê." Ebi raştî jî peyniya nê qisanê xo de vindernê û vatananê xo ahê ca. Qandê kerdinê bêrûmet, ne kesê ra tersenê û ne jî kesî ra şermayenê. Ê jî rind zanê ke, kurdî vizêr ra dinya di bêwayîr mendê. Camêrdina înan jî na bêwariyina kurdan ra yena. Amerîka û Ewrûpa jî ebi polîtîka û çekanê xoya xeylê îmkan dano înan. La belê nêzanê ke rojê yo bêro, peyniya nê îmkanan jî yo bêro. Rom lacê piyê înan niyo ke, iyê hetanî mahşer Romî xo virar de gird kirê.

Vanê mayê kurdan dinya ra îzole kirê. Na yena na mehna: "Mayê solyaxa weşîna çewres kurdî bibirnê." Noyo senîn bibo? Oyo ebi talan û qirkirdiniya bibo. Çimke mantiqê îzolasyonî de bê na ray rayna çiniyo. Çi ecêb o ke, dinya jî na raştiya bêrûmet vîneno û qe hesê xo jî nêvejeno. Na dinya wa hemdem sero jî kurdan rê vanê: "Neheqî û bêaqilîn meki, nê kerdinî yên terorîstan ê, cilan miyan kewê û merdinê xo biqawê. Dest medên xo, dewleta Rom zaf gird a." Girdina Rom jî wehşîna ci ra yena. Ka kotî de mend, hemdemîn û însanetey. Roja însaneteya sifteyîn ra na het ra hemdemîn, quweta pawitina weşîna kesan û şaran a. Kurdan bê pawitina weşîna xo se kerdo, kê rê se vato? Kewto kamcîn welatî, kotî de zinciya kamî şikito? Îradeyê kurdan çend meg verêney, na mesele wina formulê kerbi: "Eke dinya wo wazeno kurdan biyaro dadgehan ver, wa qandê nêpawitina weşîn û welatê xo sûcdar kiro. Çimke kurdan rind xo nêpawito û xover nêdawo."

Welatê kurdan biyo bandorê tirkan, eceman û ereban. Nê dewletan dest dayên pê û xo miyan de Kurdistan kerdo lete lete û xo miyan de her gi roj tayna heciqnenê. Her ser ebi hazarana kurdî bêpers û bêsewal hera xo de kişyenê. Rengê kurdan her gi roj tenekena beno vinî. Ewro kurdî tayn bo jî xover dano û xo vinibiyayîn ra pawenê. No fin homên bêrûmet, kurdan ebi terorîzmiya sûcdar kenê. Qe dewletê jî nê bandorkaran rê nêvano, kurdî jî na dinya ra yê. Bes o, hind jî kurdan mepelixnê, hind jî qir mekrê. Kirdasî de jew qise esta. A jî wina yena vatîn: "Kî şemitî, ew şewitî." Dinyawa hemdem jî polîtîkanê xo, goreyê na qisa ramnenê. Gerek ma nay rind bizanê û goreyê na rewş jî quwetê xo bikerê jew û lecê xoserînî tayna berz kirê.

Hewna jî kes nêwazeno vajo, raya biratey û aştî ray niya û hewna jî kes nêwazenê vajo, bapîra ma raşt vato. La belê ez vana bapîra min raşt vato, ancî ma vaten ra fam nêkerdo. Çimke problema ma wa herî gird raşt famnêkerdin a.

ZÜLKÜF KIŞANAK


Azadiya WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN
■ Yönetim Yerî:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308 Beyoğlu/İstanbul

TEL: (0 212) 245 16 50 – 251 79 37 – 251 90 13
FAX: 251 95 85
■ Gerînendeyê Giştî yê Weşanê (Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpirsê Karên Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.
■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım
■ NIVÎSGEHÊN TÊKILIYÊ
(İrtibat büroları)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83
■ Mêrsîn
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmîr
Tel-fax: 0 (232) 425 37 02

■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78
■ (Nûnerê Giştî yê Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swîsre:
İhsan Kurt
Tel–fax
41 21 652 76 07
■ Fransa:
M. Ali Doğan
Tel– 33 614 32 43 55
■ Belçika
I. Can
Tel:32 53 64 12 41
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel–Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helîm Yûsiv


www.arsivakurd.org

# Xançepek

## Kavila şopên winda

Seatek din wê diyar bibûya sedema wê . Bêhnek difûriya ji dîrokê , dîrokek windakirî , dîrokek ku ew û xwediyên wê bi hevdu re bi 250 milyonî hatibû firotin. Kolanên teng û biçûk, dergûşên li hewşan, zarokên di destê wan de pariyek nan û penêr û gogek teqiyayî an dîmenek ji zarokatiya min.

Dibe ku tu kes pê bawer neke, ji min re jî bihata gotin min jî bawer nedikir. Lê dîtin û gotin nabe yek, dengê hûtan li ber guhê min diket. Hûtên ku çiqas kes, dîrok û gel daqurtandina ewqas mezin dibûn. Çiqas mezin bibûna ewqas ziktilêr dibûn. Mîna qulikên reş ên li fezayê.

### Diqîriyan bi sloganan "bijî mirin!..."

Kê dîtiye ev der? Kê nivîsiye? Du niqutên jiyanê kê herimandiye? Û kê nivîsiye ev çîrok?

Em deh gavan pêş de diçin, dêrek bang li me dike. Lê derî girtî ye. Pîrekek di wir re derbas dibû. Hevalê ku rêberî ji me re dikir gazî wê kir û got: Xaltî! Mifteya vê dêrê (Dêra Keldaniyan) li ku ye? Kî lê dimîne? Li ku ne? Bi ku de çûne cîranê we?" Xaltiyê lê vegerand: "Ez nizanim bi ku de çûne. Lê mifteya dêrê li ba Hecî Eliyê Xedad e."

Yadê ev çi ye? Bila ewr vê bi nav bikin? Hetîketî, talan, komkujî. Na...Na.... û ne yek jî. Bi sed gavî wê de, me qajwajek dibihîst, em nêzikî 15 kesan bûn, em li Xançepekê digeriyan. Me li hevdu nihêrî. Berî em werin vê taxê, ji me re hatibû gotin ku Xançepek ne taxek ewle ye. Ev di hişê me de mabû û piştî wê qajwajê me gişan li hevdû nihêrî bi çavên şaşmayî. Ev qajwaj dengê zarokan bû. Li hev dixistin, kevir û şûşên gazozan li ser malekê dibarandin. Mîna guleyên ku bi ser bav û kalên wan de hatibûn barandin. Ev zarok pismam û dotmamên "generalên biçûk" yên Amedê bûn. Ev, zarokên ku li metropolan benîştfiroşî dikirin, bûn. Lê hedefa wan vê carê ne panzereke bêdîn û bêîman bû. Hedef malbateke kurd bû, lewre bûka wan ermenî bû. An jî bermahiyek...Ew jî bêdîn û bêîman bû.

Di nava cîhanekê de sê cîhan nîşanî min dabûn vê taxê. Li Kurdistanê Amedê, li Amedê jî Mehela Filehan. Min pirtûkên Migirdiç Magrosyan xwendibûn. Serpêhatiyên Qirix ango Pêxwasên Xançepekê jî bi berfirehî hatibûn vegotin. Lê tu tişt ji wan nemabû. Wan pêxwasan ne xwe ne jî cîranên xwe parastibûn. Kek Magrosyan ka kurê Mama? Ka Der Arsen, Hiçê, Ûso...! An zarok û neviyên wan. Min yek jî ji wan nedît. Jixwe kesî nedixwest wan bibîne. Naqosa dêrê nema dikir dîng dong....! Û bi dengê Minara Çarnigo re qayişê nakşîne.



Wêne: Enver Konukseve[r]

### Bi çar zimanan rojbaş

Berî van çavdêriyan ez û hevalekî xwe bûbûn mêvanê Hecî Evdirrehman. Wî gotibû me: "Ez bi erebî, kurmancî, zazakî, ermenkî, tirkî û farisî zanim." Çav li min û hevalê min bûbûn tas. Em çiqas kêfxweş bûbûn, nayê gotin. Jina wî jî li gotinên wî zêde dikir û digot: "Gelekî mirovên baş bûn ermenî." Lê piştî ku min Xançepek dît ev pirs di serê min de çêbû. Ger ew mirovine baş bûn lê aniha li ku ne? Ên nebaş kî bûn? Li gorî Hecî Evdirehman "Êvara we bi xêr" an "Roja we bi xêr" berê bi 4 zimanan dihate gotin.

Ez ji bo deh–diwazdeh rojan çûbûm welêt. Min nû Xançepek didît. Dema [...] ketim wan kolanên lanetkirî, ez poşm[an] bûm. Min fedî kir. Hîna jî ez fedî dikim. Ez wiha bawer dikim ku heta dawiy[a] emrê xwe jî ez dê fedî bikim. Ev ne te[...] bawerî ye her wiha hêviyeke jî.

Li Mehala Gawuran ez li dawiyê h[e]valên xwe hêdî hêdî dimeşiyam. Va[n] Gogh hate bîra min. Min xwest wêney[ê] vê heriyê çêkim. Ne tenê heriya li erd[ê] heriya ketibû nav gelan û mêjiyên m[e]. Min dil kir ku bibim Aragon û evînên vê mehelê, evînên kirîvan binivîsin. Her çend min du rêz nivîsîn jî dîsa jî mi[n] doza helbestvaniya Aragon dikir. He[...] valên min ketin hemameke dîrokî, k[u] xwediyên wê ermenî bûn. Min li ber d[e]riyê vê hemamê bi zarokan re sohbet k[ir] lê pîrekek bi min xeyidî. Minê dawiy[ê] fêm bikira ku ew baweriya xwe bi kes[an] biyanî naynin. Pêşî min ew mafdar dît [...] niha ez ji xwe re dibêjim: "Gelo ez biya[nî] nî bûm." Mazlûm, Niştiman û Oqtavy[a] çi navine xweş bûn. Ev nav navê za[...] rokên jineke ermenî; bûka kurdan bû. Min bêhtir dixwest Xançepekê nas bi[kim] lê li aliyekî din jî ez gelekî hêrs di[...] bûm û rev dihat bala min, min dil dik[ir] ji wê derê birevim. Çi fêde yek jî bi c[...] nehatibû.

Di vê gerê de gelek xweşikbûn, evîn[...] hevaltî, hêrs, xemgînî di dilê min û he[...] valên min de peyda bûn. Lê tiştek ten[ê] niha jî tê bîra min. Heke deh salên din jî behsa Amedê bibe, wê Oqtavya dîsa bê bîra min.

Ez bûbûm xwediyê sê çavan. Min b[i] çavê Murathan Mungan li Mêrdînê, bi çavê kurdekî li Nisebînê nihêrî û bi dil[ê] ermenîyekî li Oqtavya...

Kevnarî, xemgînî, komkujiya li we[...] latê min ev rêz bi min didan nivîsandin

*Kevirên reş, tirsek ji dil*
*Û hêmayên mirinê*
*Ez pûç bûbûm bi awirên Oqtavya*
*Min xwe vedizî*

*Diherikî ji du dilopan lehiyek bi fed[î]*
*Heyf û xebinetek derbasbûyî*
*Hate ser laşê min ê şil*
*Veger hêsantir e ji her tiştî.*

EMÎN BOZA[N]



www.arsivakurdi.o